

Nûçegihanê rojnameya hefteyî Yeni Ülke li Batmanê ji aliyê Kontr-gerîla hate kuştin.

Duşema 24 ê meha Sibate nûçegihanê Rojnameya Yeni Ülke Cengiz Altun li ser rîya karê xwe hate kuştin. Cardî berî bi çend rojan nûçegihanê (İkibine Doğru) Halit Güngen di odeya xwe î kar de hate terorkirin.

Li du hev di çend rojan de du mirovên rojnamenivîsar, yê ewil li bajarê Amedê û yê duyemîn jî li bajarê Batmanê têne kuştin  
Rûpel 15

Sal: 1 Hejmar: 2 29 Sibate-6 Adar 1992 Buha: 3000 WT (TL) Rojnameya Hefteyî

HEP 1 ê Adarê li Îstebolê dimeşe

# 'Gelên me biran in vebirrin bes in'

HEP radighêne. HEP dixwaze şer raweste û agir vemire.

Ev demeke Partiya Keda Gel HEP, ji bo xwe pêşandana 1 ê meha Adarê xwe amade dike. Li gora xeber û nûçeyên ku gihîştine Rojnameya Welat, ev xweamadekirin xwîrt û fireh e. Partiya Keda Gel ev xwepêşandan pir

● HEP ji bo biratiya gelê Kurd û Tirk roja yekê Adarê li Îstebolê dê xwepêşandaneke (miting) li dar bixe

ciddî girîye. Nûçegihanê Rojnameya Welat xwe gihandin birêvebirên HEP ê û li ser xwepê-

şandane dîtina alîkarê Sekreterê Giştî Kemal Okutan Pirsîn:

Welat: Mebest û amanc ji

● HEP radighêne. Dixwaze şer raweste û agir vemire. Ji bo vebirrinê gazî her kesî kiriye

xwepêşandana 1 ê Adarê çi ye, hun dikarin ji kerama xwe ji me re bêjin?

Kemal Okutan: Siyaseta

înkarkirin û asîmîlekirina salan, ango siyaseta nijadperestiyê, îro dixwaze gelên me bibe neyarên hev.

Desthelatdarên li serkar divên gelên Kurd bêdeng bikin û bi tenê bihêlin. Ji bo vebirrinê nuh derxistin û biryarên nuh vergirtin. 424 û

Rûpel 15


## Cedewa salan gerîna awarte

● Konseya Ewlekariya Neteweyî (MGK) "pêşneyara" xwe da rêberiya Wezaretê (Bakanlar Kurulu). Li gora vebirrinê divê Gerîna Awarte (Olağanüstü Hal) çar mehên din bête direjîkirin

Rûpel 15

## Qereqolan vala dikin

● Piştî êrişê li ser gundê Şiloka û Êrij (Çayirli) ê li Colemêrgê (Hakkari) gelek qereqolên gundên li ser sînor



Xwendin û nivîsandina bi Kurdî matê me ye jî. Ma gelo ji xwendin û nivîsandina bi zimanê zikmakî xweştir tiştêk heye?

## Welat dibe 16 rûpel

● Rojnameya Welat ev hejmar jî di nav de dê ji niha û pêde li şûna 12 rûpelan 16 rûpel derkeve. Faktorên teknîkî û çapxaneyî ev guhertin li derveyî daxwaza me ferz kir

## Civîna nasandina Rojnameya Welat

● Roja îne (21-2-1992) saet 12'ê nîvro, li Lokala "Komela Rojnamenivîsarên Hemdemî" (Çağdaş Gazeteciler Cemiyeti), ji bo nasandin û ji dayîkbûyîna Rojnameya Welat civînek hate kirî  
Rûpel 15

İsmail Beşikçi  
Kemalizm iflas dike  
Rûpel 16

Musa Anter  
Xwediyê malê şiyarbû  
Rûpel 9

## Barzanî ji Tirkiye piştgirî û alîkarî xwest

Berî bi hefteyekê Mesûd Berzanî mewanê hikûmeta Tirkiyê bû. Berzanî nêzîka hefteyekê li Tirkiyê sekinî û bi giş berpirsiyar û serokên dewlet û hikûmetê re rûnişt.

Di van rûniştinan de Berzanî û desthelatdarên hikûmeta Tirkiyê li ser çend xalên mîna "pirsa nî bi awayê jêrin bûn: PKK", "hîlbijartinên meha Nî-



sanê" û "rewşa Kurdên Iraqê û Sedam" sekinîn û bîr û bahweriyên xwe bi hev guhertin.

Berî Berzanî û heyeta pê re xatir ji Tirkiyê bixwazin, ji bo rojnamenivîsaran civînek kirin. Di civînê de pirsên rojnamenivîsaran û bersivên Berzanî

Rûpel 15

## Cehş çekên xwe datînin

Cehşê xort û nuhguhayî "Muhleta efû û lêborîna partiyê, Newrozê diqede, me bivê nevē em dê çekên xwe deynin"

"Li herêmê hejmarek mezin ji cehş û sîxuran ji bo ku çekên xwe deynin, li bendeyî Newrozê ne.

Mehên dawî cehş xwe ji cehşetiyê dikşînin. Xwe ji cehşetiyê kişandin û dev ji sîxuriyê berdayîn gihîştê bajarê Çolemêrgê jî. Li herêmê beşek mezin ji eşîra Pinyaniş li bendeyî biryara serokên xwe Mustafa Zeydan in. Beşek jî

dibêje biryara Mustafa Zeydan me girênade. Eşîreta Jîrkîya ku desthelatdarê wê Tahir Adiyaman e, dudiliye, çekên xwe deynin.

Rûpel 15

## ROJEVA WELÊT

### Serdana Berzanî...

Heftaya derbasbû Mesûd Berzanî bi heyetek çendkesî re hat Tirkiyê. Çend rojan ma û giş giregirên dewletê dîtin. Çapemenî û rojnamenivîsariya Tirkiyê cihekî xwîrt da serdan û ziyareta Berzanî.  
Rûpel 15

# REWS

Abdullah Keskin



## Dostanî û aşîti wê bi wekhevîyê çêbibe

21ê Sibate ji bo derketina Welat, me li ÇGD civînek çêkir. Rojnamevan û rewşenbîr vexwendiyê vê civînê bun. Di civîne de li ser navê Welat me gotarek pêşkeşkir. Vê gotarê di vir de em bi kurtî diweşînin.

Mêvanên Hêja,

Berî her tiştî ji bo ku hun hatine vir ez dixwazim li ser navê rojnameya me sipas bikim.

Bi giştî gava ku rojnameyek derdikeve tê pirsîn: "Çima em derdikevin?" Lê em weke ku Musa Anter di nivîsara xwe ye pêşemîn de gotî, di pirsîn: "Çima em derdikevin, çima em dernekevin?" Gelekî ku nifusa wî bi milyonan, gelê Kurd, çima bi zimanê xwe rîkarîbu bixwîne, rojnameya derxê û ji bo çî îro nexwîne û rojnameya dernexe?

Ev û pirsên mîna van bi nasandin û navandina pirsgirêka Kurdistan ve girêdayî ye. Çi ye pirsgirêka Kurdistan? Îro herkes pirs-

girêka Kurdistan dipejirîne lê bi rastî nayê naskirin. Li ber nasandina vê pirsgirêkê, nasandineke objektîf rastengên (maniyên) mezin hene. Mirovên ji vê pirsgirêkê re hasas in ji dêla ku pirsgirêkê bi her aliyên wê ve, ji aliye dîrokî (tarîhî), konevanî (siyasî) civakî (sosyal) û çandî (kulturel) derxine holê, li ser çareserkerina pirsgirêkê dixebitin. Ev tiştêkî gelekî çewte. Tu alaqa wê bi rastbîniya civaka Kurdistan re tune. Ji bo çareserkerinê dê dîtin û ramanên ji hev cihe we-

### Em, xwe û welatê xwe, gelê xwe dixwazin dinav guhertinê de bibînin. Ji vê yekê me di hejmara Welat a pêşemîn de hesreta jiyaneke nuh anî ziman û manşeta me "Ji bo jiyaneke nuh" bu

rin ziman, dê serbestî hebe.

Bi nerîneke objektîf inçex pirsgirêka Kurdistan werê fêmkirin. Dê şartên ku mirov pê dibe mirov kistasbin divê nerîne de. Demekê bi mîhraçên derve girêdan, gotin terror e, wextekî eqonomîk didîtin. Ew polîtî kayên ku li gorî van teşhîsan çekirin tev iflaskirin. Pirsgirêk mezintir bu û heya îro hat.

Ti alaqa pirsgirêka Kurdistan bi mîhraçên derve re tune. Di nav Tirk, Erebi û Farsan de pirsgirêka Kurdistan, pirsgirêkeke netewe-

yî ye. Mafên gelê Kurd hatine xespkirin. Li dijî vê zordariyê gelê Kurd li xwe, li welatê xwe xwedî derdikeve û li ber xwe dide. Pirsgirêka Kurdistan ne eqonomîk e û ne terror e. Heger qala terore bibe dê berî her tiştî terora dewletê werê dîtin.

Pirsgirêka Kurdistan, pirsgirêkeke dîrokî-konevanî, civakî, çandî û eqonomîk e. Welatê Kurdistan di nav çar devletan de bi têt û mayîna ji hevdu belavbûye. Çareserkerina vê pirsê inçex daxwazî û mafên gelê Kurd ê neteweyî ku werê naskirin mimkun e.

Gele Kurd û Tirk bi sedsalan ve bi hev re dijîn. Lê mixabin van demên talî dixwazin gelê Kurd û Tirk ji hev re bikin dijmin. Di vê babetê de wazîfên giring li ser milê rojnameyên Kurd û Tirk in. Kurd ne dijminên gelê Tirk in. Em dixwazin gelê Tirk jî dijminatiya Kurdistan neke.

Di van salê dawî de welatên dinyayê tene guhertin. Li her çar aliyên dinyayê daxwaziyên civakeke demokratîk û jiyaneke nuh tîne zimên.

Em, xwe û welatê xwe, gelê xwe dixwazin dinav vê guhertinê de bibînin. Ji vê yekê me di hejmara Welat a pêşemîn de hesreta jiyaneke nuh anî ziman û manşeta me "Ji bo jiyaneke nuh" bu.

Jiyaneke nuh, wê bi yekîti û wekhevîy neteweyan ava bibe.

# Welat kursiyê gel e

Xwendevanên hêja,

Barê me giran e, bar yê me û yê we ye. Em dê bi hev re vî barî hilgirin. Hinek em û hinek hun.

Dijwariyên me hene, karîna û taqeta me li ber çavan e. Çend sal in me bi zimanê zikmakî (anadil) ne nevisîye, me ne xwendîye. Ziman bi nivîsandin û xwendinê xwîrt dibe, tekûz dibe.

Em hayîdarên tengasî û têrnekiriyên xwe ne, em dê bi hev re van kêmasî û dijwariyan sivik bikin û ji ser rîya xwe bidin alî.

Em jî û hun jî; em mîna xebatkarên rojnameya Welat û hun jî mîna xwendevanên zimanê vê rojname em her du alî jî nûparî ne, em hê baş nebûne şareza û koneyên karê xwe. Me bi zimanê

xwe kêr nivîsiye û we jî pê nexwendîye.

Dijwarî û rastiyên hene gerek me ne tirsîn û me sist nekin. Tirs û sistî derdê me derman nake.

Nivîsandin û xwendina bi zimanê Kurdî karekî pîroz e. Erkekî neteweyî û insanî ye.

Zanayekî Kurdistan dibêje: "Kurdino heger hun naxwazin wînda bibin, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsînin".

Hezjêkirina zimanê zikmakî, zimanê dê û bavên jî ji her mirovê xwedî şexsiyetê xwestin. Em çiqasî guh bidin zimanê xwe, li zimanê xwe xwedî derkevin, ewqasî xêr e meznahiye.

Her xwendevanekî me gerek

ne tenê bi çavên xwendevanekî ku ji hejmarekê heta bi yeke din rojnameyekê dikire û bi tenê dixwîne li xwe binere. Gerek xwendevanê zimanê Kurdî, yên rojnameya Welat xwê bi xwendevanên neteweyên (miletên) din re muqayese neke û nebeje ez rojname dixwînim û bes. Divê alîkariya me bike, ji me re binivîsî e, çîrokan, peyvên pêşiyên, pêkenok û metelokan tederxistinok û tiştên folklorî ji me re bicivîne, bide hev û bi awayekî saxlem û zû bighîne me.

Kar û xizmetên me pir ketine ser hev, kultura dîroka me mîna

zeviyêke beyar e. Ev beyar têtê rax û bi goşt e. Bi xêr û bereket e, bêrdar e. Guhdayîna û karkirina dixwaze.

Rojnameya Welat qasidê nav me û we ye. Kursiyê gel e, dengê we ye û cih û şûna hevdu naskirin û hevdu dîtîne ye. Em dê bi rîya Welat deng û daxwazên hev bibîzînin, rexneyan li hev bigrin û kêmasiyên hevdu bînin bîra hev.

Em hêviyên mezin ji we dikin û em li bendeyî her celeb alîkarî û piştgirîya we ne.

Bi mînin di xweşiyê de.

## Em li benda 'Welat' in

Roj baş Welat,

Ji roja ku min ev hevok dît (Welat geş dibe) xeber navê te xwe avête nava perdeyên dilê min û têtê de cih girt, êdî ne roj bi min roj bûn û ne şev bi min şev bûn, ez mam di gumanên xweşikbûna Welat de, bejna wê ya bedew dihate ber çavên min, mîna gulekê bi min re di-keniya, ji lew re jî min dî ku ya baş ew e ku ez nameyekê ji te re bişînim, ji ber ku mîna mirovekî ku xwêzî di qirika wî de hişk bûye û av nêzîkî wî ye, êdî maye li benda vexwarina avê, ê min jî ez li benda dîtina te me, ku ez tîna xwe bi te bişînim. Bi rastî, ne ez tenê bi milyon mîna min hene ku tiyê dîtina "Welat" in.

Hevala hêja, Bi rastî derketina te pîrozbahiyeke giranbûha ye. Ji ber ku têtê di nava rûpelên xwe de gelek tiştan bînin ziman, ji kevîrên destên zarokan, şewata canê teze li ber bayê xerdel û na-

palme. Her wiha ger ku tu nikaribî mîna dayikên çav bi hêsir deng derxîni û biqîrî têtê karibî pesnê wê bidî, lê tu gopalê kalê Cizîrê ji bîr nekî ji ber ku hîn li baniyan li ba dibe.

Hevala min, Bibûrîne, ez zanim ku dema te pir tune ku tu hemî nameya min bixwîni, ji ber wê ez jî dirêj nakim, emê di demên pêş de gelek caran hevdu bibînin, lê heya ku tu karibî zû were, ez li benda dîtina te me, tu nizanî bê ez çiqasî perwerê dîtina te me, ku ez te hemêz bikim û te birûpelînim, ji ber ku ez dizanim tiştê ku ez lê digirim wê di paxila te de hebe.

Hêvîdar im ku tu tiştêkî ji min veneşêrî. Silavên min ên şoreşgerî ji bo hemû kesên ku wê alîkariya te bikin û wê te bişînin.

Roş baş û bimînin di xweşiyê de. Heya roja 22'ê mehê emê hev bibînin.

H. Sefkan

## Li ser alfebe Kurdî

Tê gotin ku dîrok (tarîx) bi nivîsandinê dibe dîrok. Pêşiyên me bi hesanî bi ser nivîsandinê venebûne.

Heta ev tîpên (herf) ku em bi alîkariya wan peyvik û hevokan (cumle) ava dikin peyda bûne, mêjyê mirovayetiye pir westiya-ye. Gelek xwêdan rîjiya-ye.

Em mirovên îro pir tiştan qerzdarên (deyndarên) hunermend û şarezayên heyamên berê ne.

Şareza û zanayên her neteweyî hene. Van mirovan xizmetên, xwe berpêkirine û ji bo gelê xwe û gelên cîhanê bûne tapo û koçan. Bûne serbilindayî û rûmet.

Yên me jî hene. Celadet Bedirxanê me yek ji wan e. Ne tenê, ji yekan yek e, belê di nav deqên wan de ye.

Çi dema gotin bê ser zimanê Kurdî, alfebe û rêzimanê Kurdî yan jî weşandina rojname û kovarekê, navê Celadet berî her navî bi bîr têtê.

Ne mimkûne bi bîr neyê.

Em difikirin, carna ji xwe û hin caran jî ji hev dipirsîn: Gelo ev alfebeya Celadet Bedirxan û hizmetên wî yên ji bo zimanê Kurdî kirine tunebûya, rewşa me dê çawa bûya?

Em bê dudilî karin bêjin ku dê rewşa me ne baştir, aloztir, bê keyetir û seperzetir bûya. Baş e ku Celadet Bedirxan heye, ew bûye qirdê me.

Celadet Bedirxan ji bo me bingeh û zemînek danîye. Avahî îro, hesantir dikare bête ava kirin.

Celadet bûye navçîkar û haşkirê me, rêber û rêpêşanderê me. Ji bo me bûye otorîte û meqamê çareserkerina gelşên rêzimanî, alfebeyî û zimanê Kurdî bi giştî.

Rojname, kovar, broşur û giş pirtûkên ku bi alfebeya Latîni derketine giş alfeba Celadet Bedirxan xebitandine. Wêşan û çapemeniya îro li jiyane ye û bi Kurdî derdikevin bi vê alfebê derdikevin.

Alfebe ev e:  
Girek: A B C Ç D E Ê F G H Î J K L M N O P Q R S Ş T U Ū V W X Y Z  
Hûrek: a b c ç d e ê f g h i j k l m n o p q r s ş t u ū v w x y z

Alfebeya Celadet Bedirxan alfebeya rojname me welat e jî. Pîroz be li me û li gelê me.

**KARTA ABONETIYÊ**

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin aboneyê Rojnameya WELAT

Nav :  
Paşnav :  
Navnîşan :

**Bedelê abonetiye razîna**

Li Tirkiyê: Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu Şub. Döviz tevdiat hesap No: 3113617

**Aboneyên hejâ,**

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevli kopyeka pelê razandina bedelê abonetiye bişînin. Navnîşana WELAT Başmusahip Sok. Talas Han No: 16 kat: 3, No: 301 Cağaloğlu / İSTANBUL  
Tel-Fax: 512 12 87

**Mercên abonetiye**

Li hundir

6 meh	60.000	30 DM
12 meh	120.000	60 DM

## Qereqolan vala dikin

(Halit Yalçın / Çolemergê)- Piştî êrişê li ser gundê Şiloka û Êrij (Çayirli) ê li Colemergê (Hakkari) gelek qereqolên gundên li ser sînor hatine valakirin.

Li gundên Hare, Qewal, Anîtos, Dîzêya jêrîn, Çemikan, Nîspas, Kelêtana Seyîda, Welto û gelek gundên din jî qereqol têne valakirin. Û cendirmeyên di van qereqolan de jî anîn li Tugaya bajarê Çolemergê bi cih kirin.

Li gor agahiyên ku gihîştine me, piştî biharê wê li qereqolên gundan jî endamên tîmên taybetî (Özel Tim) werin bi cih kirin. Li aliyê din gundî naxwazin endamên hêzên taybetî (Özel Tim) li gundên wan bimînin. Gundî hêrsa xwe wiha tînin zimên: "Ger Özel Tim werin qereqolên gundên me, em ê jî dev ji gundên xwe berdîn."

## Li Çolemergê Komela Mafên Mirovan vebû

Komela mafên mirovan (IHD) liqê Çolemergê ji aliyê çend welatparêzan ve hate vekirin.

Serokê liqê Çolemergê Abdulkarim Demîrer "Em dixwazin ji her alî ve xizmeta mirovayetiye bikin. Me dît ku di derheqa mafên mirovan de gelek kêmasî li cihê me dibin. Me xwest ku em wan kêmasîyan berteref bikin û nehêlin zerer bighe mirovan. Emê beveranîya mafên milletê xwe bikin.

## Mizgîniyeke xweş

Tewlo derdikeve. Tewlo kovareke qerf û pêkenokan e. Kovar dê bi zimanê Kurdî û Tirkî derkeve.

Berpirsiyarê Giştî Tarik Tolunay û yê pêkenokan jî Xelîl Ziravav e. Belê, Tewlo em bi çar çavan li bendeyî Tewlo ne.

## Li Midyadê 11 girtî

Li Midyadê ji 51 mirovên ku di dawîya meşa ji bo kuştina Mehmet Nuri Cebe de xistûbûn bin çav 11 mirov hatin tewqîf kirin. Naven kesên girtî ev in: Kerim Arpa, Alattin Keleş Mehmet Salih Demirtaş, Cermal Aktaş, Necmettin Bilgiç, Salih Dilmen, Bayram Teomay, Ramazan Ertekin, Mehmet Altunkaynak, Hayrettin Bektaş û Abdurrahmen Gül.

# Wê kî karê parlamento bike?

● **Hatip Dicle: "450 parlamenter hene. 60-70 kes ne tê de, parlamenterên mayî karê xwe nakin"**

Parlamenterê bajarê Diyarbekrê Hatip Dicle ji bo parlamentoya Tirkîyê çî dibêje?

Parlamenter mirovên siyasetê ne. Birêvebirên siyasetê û alternatîvên siyasî ne.

Parlamenter ji rehetî, xweşî, kar jîyan û wêbêya giş rûniştvanên welatê xwe berpirsiyar in.

Di parlamentoya Tirkîyê de 450 parlamenter hene. Çend kes ji wan wezîfa xwe dikin?

Çend kes ji wan xwediyê gotina xwe ne û li sozên xwe yê dema hîlbijartinê (seçimê) xwedî derdikevin?

Hefteya derbasbû, Partiya Keda Gel HEP li bajarê Bursayê panelek li dar xist. Di panelê de Parlamenterê Amedê (Diyarbekir) Hatip Dicle, Yalçın Küçük û Sekreterê Giştî yê Partiya Keda Gel, Ahmet Karataş jî amade bûn.

Dicle di axaftina xwe de got: "450 parlamenter hene. 60-70 kes ne tê de, parlamenterên mayî karê xwe nakin. Giş yê çep û rast û yê şerîetxwaz hemî di nav nekirkêriyeke her rojî de wextê xwe dibhurînin û serê xwe bi pirsên siyasî naêşînin. Mirovên alternatîvên siyasî diafirînin, siyasetê çêdikin û serê xwe bi pirsgerêkên gel dêşînin, di girtîgehan dene û li serê çîyan in."

Yalçın Küçük jî ji aliyê din rastiya ku Hatip Dicle tilîya xwe pê vekiribû anî zimên û ev go: "Dewletê mirov kirine kêzik û kurmik. Ferqa însanan ji kêzik û kurmikan nêmaye. Televizyonê û teknîka din, hêjatinir xisletê mirovan ku, fikirkirine ji destên wan girtiye. Rewşa me û ya parlamenteran jî ev e. Xwedî li me bê rehmê."

## ROWŞA KURDAN PEYIVÎN

# Pirsa Kurdan di parlamentoya Swêdê de

M. Xarpêtî

Di roja 26.01.1992-an de ji partiya Çep (v) Berith Eriks-son, partiya Sosyal demokrat (s) Hans Göran Franck, partiya Gel (fb) Ingela Mårthammar, partiya Navendî (c) Ingbritt Irhammar û ji partiya Swêdî ya Demokrat a Xirîstîyan (kds) Pontus Wiklund bi hevdu re di derheqê pirsê Kurd de pêşniyarnameyê (önerge) hevbeş dane parlamentoya Swêdê.

Her pênc parlamenterên Swêdî, di pêşnameya xwe de, li ser rewşa Kurdan ya dîrokî, civakî û siyasî rawestan. Bi zîmaneke vekirî li her perçeyê welêt zilm û zordariya ku li ser Kurdan heye, di pêşnameya xwe de anîn zimên. Wan di pêşniyarnameya xwe de, dan diyarkirin ku li her aliyê welêt qet mafê Kurdan ê netewî û demokratîk nîne, Bi salan li ser zîman, kultur û wêjeya Kurdan stembarî û qedexe her berdewam e.

Piştî van agahdariyên li ser Kurdan, parlamenterên Swêdî dixwazin parlamentoya Swêdê li ser van deh xalên (maddeyên) jêrin biryar bigire:

1- Divê parlamentoya Swêdê biryar bigire ku hukimet pirsê Kurdan bibe Koma Neteweyan.

2- Divê biryar bigire ku hu-

kimet pirsê Kurdan bibe Konseya Ewropa û Tirkîye, ew peymanên ku ji bo mafên mirovan îmzakiriye nedin bin lîngan û wan bi cih bîne.

3- Divê Swêd li Konseya Ewropa û Konseya Hevkarî û Ewlekariya Ewropayê dawê bike ku Tirkîye li rojhilatê Tirkîyê qanûna Awarte ji navê rabike.

4- Divê Swêd bi xwe li Konseya Ewropa bala Tirkîyê bikişîne, ku ew mafên mirovan nede bin lîngan.

5- Divê Swêd ji Konseya Ewropa bixwazê ku li Iraqê mafên Kurdan bi riyeke aşî çareser bibin û Koma Neteweyan pêşengiya vî karî bike.

6- Divê hikûmet ji bo parastina Kurdên Iraqê roleke aktîv bigire.

7- Divê parlamento biryar bigire, ku alîkariya humanîstî dom bike.

8- Dê li Kurdistanê Iraqê hîlbijartin çêbibe. Divê parlamentoya me wezîfe bide delagasyonekê ku ew herin Kurdistanê Iraqê û çavdêriya wê bike.

9- Li Koma Neteweyan Swêd însiyatîv bigire, ku Suriye hemwelatiya ku ji Kurdan girtibû, bi paş ve bide.

10- Parlamento ji bo alîkariya pirtûk û materyalên dibistanê alîkariya Kurdistanê Iraqê bike.

# KONEVANIYA NUH

Nizamettin Toğuç

## Li ser durûtiya dewletê

Ez dixwazim di vê nivîsarê de pêşî liser Şertê Parisê hinek tiştan bêjim. Şertê Parisê 10 Riknên wê hene.

1- Dewletên cihanê pêwiste ku bi rûmet wekheviyê damezirînin.

2- Bi hêz û kotek kes neçe ser welatan.

3- Dest navêjin nava tixûban.

4- Axa welatan perçe nekin.

5- Pirsgerêkên navneteweyî bi aşî safî bikin.

6- Ne tîkiliyên navneteweyî bin, gerek tu welat destê xwe, dirêjî nav welatên din neke.

7- Dîtin û raman, konevanî û ramiyarî, tev ji bonî mafên mirovan bin.

8- Wekheviya mafên gelan û qedera xwe bi xwe çêbikin.

9- Hevalbendiya dewletên cihanê bikin.

10- Di mafên navneteweyî (enternasyonal) de niyetek rind girîng ku were pêk anîn.

Belê ev 10 riknê (AGK) ê ne. Dewlet 1990 de binê van riknan îmze kirine lê, yek bi tenê ji van riknan pêk naniye, Ezê hinekî ji vê dirûtiyê bahs bikim, di xaka Iraqê de jimara wan ne qasî 300 hezar kesên Azerî hene, Dewleta Tirk qîr û hewar dike, dibê Tirkê Iraqê dibin zilm û kotekiyê de ne. Lê belê Sedamê hov li Halepçe jehrê dibarîne, 10 hezar jin, pîr, zarok û ciwan qetlikir. Gelê alemê tevî tîfin li Sedam barand, lê dewleta Tirk dengê xwe jî dernexist, ji pêşmerga re dibê, mahcir hatine nav me, tu derbê jehrê (kimyasal) li wan tunneye, Dewleta Tirk bi vê jî nesekinî Ecevit bi rê ket çû Iraqê, Sedamê xwînîj pîroz kir. Di hatina Tirkê Bulgar de Halterçiyek bi nav û deng hebû Naim Süleyman, bi keda Dewleta Bulgar hatibû ser hemd û hêla xwe, wê çaxê Dewleta Tirk Naim di berberî zêra de kişandibûn û anîn Tirkîyê, ew rûmeta ku jê re hate kirin ji 1000 Tirkê Bulgar re ne hat kirin û ev mirov bi paşde veşeriyên li hatina xwe poşman bûn, Dewleta Tirk ji ber ku tu fêda wê çênebû tu qîmet neda wan. Rojnamevanekî xerîb ji mirovekî pirs kir ku hûn çima ji welatê xwe hatin, mirov go "Liser me zordestî hebû, lewra em hatin, dixwestin me bikin xiristîyan" Dewleta Tirk di vir de jî tê xuyakirin ku, Dewleta Azad weke Qibris li Bulgarîstanê ava bike, Dewleta Tirk li Qibrisê jî Dewletek bi kotekî avakir, hevalbendê wan weke Emerîka ji ew Dewleta hêj qebûl û nas nekiriye.

Lê mebûsekî ANAPê derdikeve kursiyê Meclîsê dibê "Bavo cihan ji me çî dixwaze em kesî re li ser masê rûnanên me Dewletek serbixwe û azad ava kirîye tu hêz tu qewet nikare me bide erdê "Belê, di hêla din de îmza li bin Şertê Parisê ji bîr dikin û Gundên Kurdan xira dikin, dişewitînin, gelî û devîyan ji kokê de dibirrin bi bomba êrişî gundiyên neçar dikin pîsiyên mirovan bi gundiyan didine xwarin, jinan li meydanên gundan dicivînin li pêş mêra îclav tazî dikin, bi kotekî gel dibin çoyê dirêj re derbas dikin. Li Qulpê, Licê û Mêrdîne, xwîna gundiyan Kurd hêj zuwa ne bûye, Dewleta Tirk rast û rast, heşkere Qirkirina gelê Kurd dike. Ev hezar sal in ku ev qirkirin li ser gelê Kurd tê meşandin lê, îroj tişteki gelek xweş heye, Gelê Kurd bi xwe, li namûs û Rûmeta xwe, bi gernasî, bi dil û can dibe xwedî, bi sed hezaran li dij kotekiyê derdikevin. Ezîziya dewleta Tirk, biratiya me û wan eve.

# Tu ji bo çi çûyî Ewrûpa?

● **Ev nivîsar di derheqê rewş û pirsgrêkên Kurdên li derveyî welêt, li Ewrûpa dijîn, hatiye nivîsandin. Nivîsên di vî babetî de, di hejmarên peşya me de, wê dom bikin**

## Dilbixwîn

Ji ber gelek egeran (sebeban), bi sedhezaran girsên gelê Kurd dev ji welatê xwe berda-

ne û hatine li Ewropaya niştecîh bûne. Li her çar perçeyên Ewropayê malbatên Kurd, ku pîraniya wan di rewşeke debariyê nebaş de dijîn tîn dîtin.

## Îsraîl ket nav erdên Lubnan

Bi kuştina serokê Hîzullah 'Şêx Abbas Musavî', Îsraîl û Hêzên Hîzullah hinde êrîşan birin ser hev de. Piştî van êrîşan Îsraîl ket nav erdên Lubnana başûr û girt ser gundên ku Hîzullah jê bi roketa êrîş dibir ser bakûrê Îsraîl. Îsraîl tevî van her du gundan du qotên stratejîk jî kirin destê xwe.

Di dagirkirina van gundan de Hêzên Aştî yên Yekîtiya Netewan xwestin ku rê li ber leşkerên Îsraîl bigirin, lê Îsraîl bi buldozeran di ser wan re derbasbû û bi vî awayî gundên 'Yater û Kafra dagir (îşxal) kir.

Di van êrîşan de 3 geryayên Hîzullah û 3 jî leşkerên Îsraîl hatin kuştin, 5 jî

birîndar hene.

Ev êrîşa Îsraîl di nav welatên dinyayê de gelek rexne stend û ji alî Hêzên gelemperî yên navneteweyî hat protesto kirin. Îsraîl jî xwe da paş û dageriya nav sînorê xwe.

Hêzên Hîzullah, di dawîya ku Îsraîl van gundan vala kirin, nuh ve ketin gundên xwe û ji van gundan bi roketan êrîşên din birin ser bakûrê Îsraîl. Di vî êrîşa dawî de zarokê Îsraîlî mir û 3 mirovên wî jî birîndar bûn.

Tevlîheviya mintîqê dom dike û herdu alî gefan li hev dixwin. Ev sekna niha mîna bêdengiya berya firtonê ye û herkes li hêviya teqînên nuh sekinî ne.

Ne tenê li welatên Ewropayê, lê belê li Erebiyan, Awustralya, Efrîqa... û heya tu digihêjî Emerîka. Bi rastî mirov neçar dimîne ku kesereke kûr bikişîne. Tu neteweyan weke neteweyê Kurd bi vî awahî koça xwe bar nekiriye û ne çûye bi salan li biyaniyê niştecîh ne bûye.

Bê guman, weke ku me li jorê jî diyar kir egerên vê koçkirin û reva ji welat ku ji bajarvaniyê re bûye dergûş û dayîk, gelek in. Mirov nikare bi çend xêzan wê destana dîr û dirêj bîne ziman û wê meşa biyaniyê bi hesanî şîrovebike.

Rojnameya me (Welat), bi mebesta çêkirina lêkolînekê derbasî nava vî gelê penahber bû. Belê bi sedhezaran gelê me li derveyî welat penahber e. Me ji bo ku jiyana girsên gelê xwe yê li derveyî welat nas bikin, şeş (6) pirs amade kirin. Em wan pirsan ji girsên gelê xwe yê ku li Ewropa dijîn, dikin. Ne tenê ji perçeyekî welêt, me ji Kurdên her çarperçeyan pirsîyar kirin. Belê, girîng e em derdên wan bizanibin.

Ji ber ne gengaz bû (ne mumkîn bû) em her kesî yeko yeko pirsîyar bikin, me beşek ji wan mîna nimûneyan girt, lê mirov dikare bibêje ew beş dikare bersivê ji ber hemû kesan ve bide. Rast e, me ew beş mîna nimûneyekê pirsîyar kiriye, lê rastiyekê tîne ziman.

Pirsên ku me ji welatparêzan kirinê ev in:

- 1- Ji bo çi tu çûyî Ewropaya?
- 2- Ev çend salên te bûne ku tu li Ewropayê dimînî, te di van salan de çi zor û zahmetî kişandin?
- 3- Pirsgrêk û problemên te



**Xwedî derketina li welat rûmeta mirov e. Kesê li xwe û li axa xwe xwedî dernekeve di naw civata mirovan de cihê wî li nav şekalan e. Nav şekalan jî kirête û bi mirovên çê nakeve...**

çi ne?

4- Tu dixwazî vegeerî welat, çima?

5- Ji bo te welat tê çi wateyê (maneyê)?

6- Bi kurtî, banga te ji wan kesên ku dixwazin welat berdin û herin li Ewropa bijin, çi ye, tu çi mesajê ji wan re dişînî?

Em hêvî dikin ku ev her şeş pirs bikaribin bersiva gelek pirsên din ku ne hatine nivîsandin, bidin. Her wiha em ji hemû xwendevanên xwe yê hêja tika dikin, ku di vî warî de alîkariya me bikin û di derbarê van pirsan de pêşniyar û nêrînên xwe pêşkêş bikin.

- **H. Ahmed** (30 salî, ji Bakurê Welat)- Almaniya: Di 70'yan de gelek karkerên me çûne Ewropê, dema ku vedigeriyan welêt, me didî ku rewşa wan bi regekî din

bûye. Bi çente, radyo... û geografî vedigeriyan. Bi rastî, em jî xizan bûn, êdî me jî di dilê xwe de digot: "Bila em biçûyana Ewropê çi dibû, bila bibûya." Bi vî rengî, çûyîna Ewropa di dilê min de jî bû hesretek? Her wiha ji bo peryan ez hatime Ewropa.

Ev 12 sal in ku ez li vir dimînî, dikeve 13 salan. Di van 12 salan de min ji her hêlê ve zor û zehmetî kişand. Ji ber ku em porreş bûn, biyanî bûn, xanî û kar ne dane me. Dema ku kar didan me jî, bi rastî tu kesî ew kar li xwe qebul ne dikir ku bike. Ji hêla pisîkolojî ve tesîreke mezî li me kirin, dikin jî. Bi rastî jiyana me ji ya heywanan jî xerabtir bû. Belê, çend mark didan me, lê hema bi çi half didan? Her demê li serê me dikirin serhevde, digotin em peran didin we, em we xwedî dikin. Dixwestin me wekî koleyan li cem xwe girêdin.

Niha pirsgrêk û problemên min çi ne? Niha hinekî rewş hatiye guhertin. Ez niha bi çavêkî din li Almaniya dinêrim, êdî em bi çavêkî welatparêzî li Almaniya dinêrin. Dem ne weke berê ye, xebat li welêt pêşve diçe, wê pêşveçûnê tesîreke mezî li min kiriye. Ez, êdî dikarim tiştan ji hev cuda bikim. Zehmetiya min a yekemîn ew e, ku ez biçim welêt. Ez naxwazim 30 salên xwe li vir tijî bikim. Ez du caran emeliyat bûme, mîdeya min diêşe, gelek nexweşî li min peyda bûne. Bi kurtî, ez dikarim pirsgrêkên xwe bi pîrsa vegeera welêt ve girêbidim.

Bê guman, wekî min ji destpêkê ve jî diyar kirî, di vî demê de vegera min a welêt armanca yekemîn e. Ji ber ku ez dixwazim tevî pêşveçûnên li welêt çêdibin bibim.



## GOTÎN

Yaşar Kaya



## Welat û xwendevan

Êdî bûye adet, kengî rojnameke nuh derkeve berpirasiyar yan jî nivîskar dinivîsin "em ji bo çi derdikevin?" Lê belê vê heftê ez heznakim tiştêkî wisa binivîsim.

Xwendevanên me di Welat'de wê me bixwînin, lê gelo baş dizanin em kî ne? Gelê me Musa Anter, Abdurahman Durre, Faqê Huseyn, İsmail Beşikçi, Leyla Zana û Hatip Dicle rind nasdike. Mamoste bi nav û deng, milletvekiliyên me yê navdar in. Lê belê Talat İnanç, Yaşar Kaya, İsmail Gökdaş, Dilbixwîn, Aysel Doğan, A. Dikili, Hüseyin Deniz, Mustafa Demir, Evîn Aydar, Kîne, xelkê kû derê ne, çi şuxulî dikin, ji ku derê tîn, diçin kû derê. Vê baş nizanin. Ji bo vê

yekê ezê îro xwe bidim naskirinê. Dil dixwaze mamoste û zanayên me yê din jî tiştêkî wisa bikin.

Ez di sala 1938 de li qeza Xersê, li İdirê hatime dinyayê. Navê gundê min Muçê'ye. Min dibistana ewil û ya orte li İdirê xwand. Paşê ez rabûm hatim Stembolê. Li lîsa Kabataşê min lîse xêlaskir. Sala 1958 de ez çûm. İstembolê zaningeha iktisadê. Wê salê em hatin girtin. Em 49 mirov di zîndana Herbiyê de di hucran de 129 rojan man. Kesî kes ne didît. Hevalê me Emîn Batû (Eminê Tinatê) şehid ket. Me gelek zor û zehmetî kişand. Ez sala 1961 derketim derve. Sala 1963 de me sê-çar hevalan kovara "deng" derxist. ez berpirsiyare nivîsaran bûm. Ez hatim girtin. 47 rojan ez di hepsa Sultanahmedê de mam. Paşê mehke me ez berdâm. Dewiya ku hevalan me yê Kurd hatibûn girtin. 10 rojan şunde ez jî girtim. Em bûn 23 heb. Di nav me de Kurdên İrane û yê Iraqê jî hebûn. Em salekê di hepsê de man. Di nava wê salê de li Balmumcu, Koşka Zi-

verberê, Mamak, Zırhlı Birlik, Sultanahmet û li hebsa Orhaniye em gerandin.

Di sala 1964 de em derketin. Hevalên me yê Kurdê İnanç û Iraqê jî Tirkiyê' derxistin. Min jî di sala 1965 de zaningeha xwe qedand û çûm eskeriyê. Lê belê ez bûm fermanîdar (subay) Paşê rutbên min jêkirin. Ez hepis kirim. Ji min re gotin tu "Kurdçiyî" tu nabî subay, tû î bibî esker. Min 24 mehan li Geliboliyê di alaya sorgonê de eskeriya xwe xelaskir. Paşê ez hatim çûm Qonyayê min çar mehan ji sorgona xwe xelaskir. Ez 1968 de zivîrîm hatim İstembol. Paşê ez çûm ji welatê xwe zewicim. Niha 2 zarokên min hene. Berîvan doxtoriyê dixwîne, Dara hê li lîseyê ye. Ez li İstembolê rûdinim. Heta niha ev 10 sale tevî tu partiyan burjuvaziya Tirk ne bûbûm. Kengî li dinyayê bayê azadiyê û demokrasiyê rabû me jî bi hevalan re civata xwe çêkir, me go ji me re jî partî lazîm e. Me HEP rêzavakir. Ez ji vî sala çûyî ve di komîta merkezî de dixebitim.

Nivîskarê Expressenê bîrve dike, ku generalên Tirkan hêjî di pey macerayên leşkerî de ne. Bi sed hezaran artêşê (ordiyê) ber bi Rojhilatê Başûr seferber dikin û vebirînên nuh plan dikin.

Ji aliyê din ve ji Mustafa Kemal dîtinên Ewrûpaya demokrat avêtine alîkî û nerînên nîjadperest û dagîrker ji xwe re kirine rêber. Wek tê zanîn gelek dîtinên felsefî û ekonomîk serkaniyê wan ji Ewrûpayê derketine. Di vana de çawa dîtinên kevneperest û nîjadperest hene, wisa jî baweriyên humanîst, demokrat, welatperwer û sosyalîst jî he-

Têkiliyên Tirkiye û komarên "Turkî"

## Lîstika mezin

● Li Swêdê di rojnameya Epressen de (13 Sibit 1992) nivîsarek li ser tîkiliyên Turkî û komarên Sovyetê yê belavbûyî derket. Em vê nivîsarê ji xwendevanên xwe re pêşkêş dikin

ne. Expressen ji xwe re heta paşverûtiya Tirkiyê li dijî îslama fanatîk bêtir nêzik dibîn. Tehran û Enqere bi hev re ketine rekabetê ji bo balyozxanên (sefaretên) xwe li wan dewletên Sowyetê yê berê zû vekin. Evya wek listikek dî-

lomasiyê bi gelek problemên girîng di pey de hene. Emerîqa di vê pîrsê de li pey Tirkiyê ye.

Her çiqas kêmanî û şaşîtiyê Tirkiyê (wek zordarî ya li ser Kurdan û sûcên li dijî mafên mirovayetiye hebin jî) cardin

modela Tirkiyê kare bibe mînakê ji bo wan dewletên feqîr û paşdemayî.

Imperatoriya Osmaniya kevn bi çend macerayê bê wîcdan xirabû çû. Di dema şerê cihaneyê yekemîn de Enver Paşa 100 hezar leşker şiyand ser Rusyayê. Ji van sed-hezaran tenê ji dehan yek jî paşve ne zivirî, 200 hezar şiyand ser Misirê û li vir jî aliyê Îngilîzan ve hate pelçiqandin.

qandin.

Wê demê mirovek temaşeger li ser macera Tirkan wiha nivîsiye: Li gor planên Tirkan bi hezaran devan herin ser qenala Suweyşê û li vir agir bi purtê wan ve din. Deve wek bi mantiqî difikirin wê xwe bavêjin nava avê û paşê Tirk karin di ser wan re derbas bibin.

Generalên Tirkan wek şermek dîrokê ne û imperatoriya wana westiyayî, xirab û perçebû. Çend salan paşê Mustafa Kemal Tirkiyek modern çêkir û ji vê rojê û virde Tirkiye mirovê Ewrûpayê herfî feqîr e.

Expressen

## Derewên Padîşah

Kî nizane ku dewleta Padîşah direye ewran? Hemû şênîyên gund û bajarên, he tenê nikarin tîr mast û nîvîşk bixwin, belê nikarin zikê xwe ji nanê tîsî û kartolan jî tijî bikin. Ev çi ye? Caran bûye ku mirovê jî nêza dimire, soz bide cîran û mirovên xwe "Ezê tîra we goştê sor, birinc û fêkiyan bidim." Na, mirovên gewriya wan bi qasî ya gamêşekê stûr bûye, deng ji wan dernakeve çî xema wan kesekî din nîn e. Belku dizanin derewan rêzê bikin, weke bilbilan sozên sexte bidin, belê qet nikarin serê xwe yê keçel veşêrin. Ne tenê nikarin du kilîtan bidin her kesekê, belê ez baş dizanim ku, nikarin çadirekê û komek komir jî bidin her malekê. Ji înfilyasyonê, deynên xwe yê derveyî û hundurî fedî nakin, vêca behsa alîka-

● Ez baş dizanim, ew "efendî" heta dehan ji ba kesekî nebin, nehan jî nadin. Rastîniya mirovatiya we jî ev e. Çiroka 1600 kg goştê kifîkî ji ku we şandiye ev bi xwe ye

riya xelkê dikin. Bi rastî min nizanibû evçende ehmeq jî dikarin hebin.


Ev çawa dibe mirovekî bi parsê dijî, behsa dayina zikata malê xwe bike. "Efendî" Ma çima wê bidin te û tu bidî wan, mîrîk bi xwe dikare bide. An jî hûn vê pêlê, hûna parêzvanê nefîta "wan" in. Xwe nexapînin, nexweşiya penceşêrê (kansêrê) kezeba we girtiye û Melkemot jî nikare we xilas bike.

Eve çende rojin Sergamêş li paş deryayên dîr, li welatê gava-

nan digere. Maşallah protokolekê li du ya din îmze dike. Belê çî fayde ye, gelek "camêr" weke wî bilind firî û dawî li nava gollan... werbûn.

Xeman nexwe "efendî" bi rêzê dor gihîştîye we, tu, qerqodeyê berdestê te û kudîkê jehrê xwediyê ber çavikan, hûn dê bi hev re bar bikin, herin dujehê (cehenemê).

Ji du-sê mirovên bi te re, ez yekê ji wan baş nas dikim, dayka wî jî zimanê te du gotinan fam nake, ev çawa dibe ji riha bavê



xwe fedînake avê li destê te dike.

Duh êvarê, ez bi tenê bûm. Min dixwest seyra televîzyonê bikim, ji nişka ve rastê qehîte te yê zelot hatim. Di destê te de pelekê dirêj hebû. Min dît çawa te di hebûna efendiyên xwe de, sêzdeh virên ji xwe mezintir kirin.

Ew çende dema min nîne, ez virên te tevan li vira rêz bikim, lê hema ka em çendekan bînin bîra xwendevanan:

- Firotiya şaristanî û alfeyan ji bo çend gelên ji me dîr dijîn -gelên hûna ji nuh ji bin nîrê wî mirovê ser bi nexşe derketine û ketine ber rehmeta hirçê salê-De ka bêje lo, tu çiqas entegre bûyî heta alîkariya entegrasiyona gelên din bikî.

- Eger tu êdî nikarî hebûna welatê min bixwî, ku bostek erd ji te dîr e, tu dê çawan sererd û bînerdên xelkên dîr ji xwe re bî-nî, ew cih û warên ku 6000 km jî te dîr in. Pey nekeve ew rê girtî ye.

- Kî behsa totalîteriya xelkê bike, mafê we bi xwe nîne. Ma ne bavê we "seydayê" Hitler û Musolini ye. Heta sê mehên din ez bêjim gunehên we yê rojekê naqedin. Vêca hûn dê alîkariya xelkê bikin. Herkes we bavê kulê û xwediyê kelepore wêrankirin, hingavtin û girîkirinê dizane. Belê, ez vê derewa we hinekî derfeta bikaranîna wê dibînim, helbete hûn dikarin serpehatiyên xwe yê bixîzî kuştina gelan bidin mirovên weke xwe, bi rastî ev gelekî li bêjin û bala we tê. Çî fayde ye mîna keriyên pezan çî gelek (miletê) nema ye! Wê çaxê ev derewa we jî bi cih nayê.

- Padîşah efendî, ez bawer dikim tu hûna nizanî di xwaringeha Ewrûpa de xwarinê bixwî. Vêca ji kuderê tu bûyî Ewrûpî heta "pismamên" te xwediyên

hespan bibin Ewrûpî. Ez fortê Ewrûpa jî nadim, ji ber ku ez vê rastiyê dizanim li Ewrûpa çiqas pere di berîka te de hene, buhayê te jî ewqas e.

- Tu ji efendiyê xwe re dibêjî em bi hev re alîkariya wan belengazan bikin. Efendiyê te jî weke min gotî, dizane ku tu dirêyî ewran. Ema çare tune ye, balefirên wan neçar in di balefirgehên xwe de,

- Ku ne bi xêra we li ser erdê gel avakirine benzîne dagirin û hinekî bêhna xwe berdin. Vêca ji ber fayda xwe û ji bo ehmeqîya we dibêje, em bi hev re alîkariyê dikin.

Ez baş dizanim, ew "efendî" heta dehan ji ba kesekî nebin, nehan jî nadin. Rastîniya mirovatiya we jî ev e. Çiroka 1600 kg goştê kifîkî ji ku we şandiye ev bi xwe ye.

- Padîşah efendî, evqas jî dibe tu xwe bidî ber teknolojiya Japonê. Mane hûn hûna nizanin derziyê qul bikin. Vêca Japon wê bi hewceyê koordînasiyona we bibe. Tu nizanî Japon bixwaze bi kompiyoterê jî mabe dikare tîstê xwe bighîne her cihêkê. De here koordînasiyona xwe ya ji hevketî pê serê xwe yê keçel veşêre.

Padîşah efendî, de rabe zû buxçîka xwe bide hev, te û wan deran çî gotine hev, ancak mehek maye wê li ber deriyê we qiyamet rabe. Yê heta niha girêdayî mabûn, zincîrên koledariyê çirandine. Yan ji we û yan ji wan e. Encam jî ji min ve xwi-yaye. Zû yan dereng ji welatê camêran derkevin, yan jî wê seriyên we li ser sêrguhan bigindirin.

Padîşah bawer bike tu ji Şahê Îranê ne shahtîrî û ne jî ji Batîsta û Franko xwîrtîrî.

Heta roja reş bi serê we de were, ji hemû gelên cîhanê re hezar silav

## Tirkiye ji NATO leşker dixwaze



Dewleta Tirk, li gor stratejiya NATO, ya nuh, ji bo "herêmên bi rîsk" "hêza pîrneteweyî" xwest. Ev hêz wê li Rojhilata Başûr an jî li Rojhilat were bi cih kirin.

Korgeneral İlhan Kılıç di derheqê stratejiya NATO û Civîna Romayê de, ji bo çapemeniyê wiha go: "Daxwaza Tirkiye ew e, ku tumeneke pîrneteweyî li Rojhilata Başûrê Tirkiyê her dem

bimîne, ku li wir rîska şerekê navendî gelek xwîrt e." Baştir eger şerê li herêmê ji hêla hêzên pîrneteweyî ve were meşandin. "Ne yeko yeko, pîrneteweyî baştir e, ger pozberiyêke piçûk be jî.

# Şerê berxwedanê şerê xweparastinê ye

M. Ali Tüysüz

Zulm û zordariya ku li ser Kurdan heye, însanê me mecbûr kiriye xwe biparêze. Hemû civat yan jî gelên ku li ser vî erdê cihanê dijîn, ji bo ku hebûna xwe bikaribin berdeyam bikin, di dîroka xwe de, dem bi dem li dij sîstemên kedxwarî derketine. Lê belê Kurdan ji hemû gelên cihanê zêdetir li dij vî rewşa derveyê însanîyê li ber xwe dane û ji hemû gelan zêdetir ji bo azadiya xwe, xwîn rijandine.

Zulm û zordariya ku li ser Kurdan heye ne tişteki nuh e.

● **Rewşa ku em tê de ne însanê me mecbûr kiriye xwe biparêze. û gelên cihanê ji bo ku hebûna xwe bikaribin berdeyam bikin, di dîroka xwe de, dem bi dem li dij sîstemên kedxwarî derketine. Lê belê gelê me ji hemû gelên cihanê zêdetir li dij vî rewşa derveyê însanîyê li ber xwe daye û ji bo azadiya xwe, tekoşin kiriye û xwe parastîye**

Berê ku M. Kemal Komara Tirkîyê damezirandiye welatê me nêzîkî 900 salan di bin destê Împaratoriya Osmanîyan de bû. Yanê padîşahan em îdare dikirin. Wê demê jî,

Kurdan dixwest wek însanên azad bijîn. Lê, Osmanî li dij vî derdiketîn. Ji ber vî sedemê, pirê caran şer di mabêna Osmanîyan û Kurdan de derdiket. Dûre Osmanîyan

û Farisan welatê Kurdan di nav xwe de cara yekemîn 1639'an parçekirin. Welatê Kurdan di navbera Osmanîyan û Farisan de bûbû arena şer. Şerê Cihanê ku 1914'an dest pêkir û çar salan ajot, dawîya Împaratoriya Osmanîyan anî. Di vî şerî de welatê me dîsa parçe bû. Îcar Împeryalîstan welatê Kurdan parçe kirin. Tirkan, di bin serokatiya M. Kemal de piştî şerê Cihana Yekemîn Komara Tirkîyê bi alîkariya Kurdan damezirand. Dema ku

hate perçiqandin.

Di salên mabêna 1940 û 1968'an de gelê Kurd bê deng ma. Kesî newêribû xwe bilivîne û daxwazan ji bo ziman û kultura xwe bike. Kesî newêribû behsa hebûna mîletê xwe û heqê wî bike. Kurd pir hatibûn asîmîle kirin.

Di salên mabêna 1968 û 1980'an de gelek rêxistin, kovarên şoreşger û welatparêz derketin holê û behsa hinek heqan kirin. Lê ji bo ku wan şerekî bi qerar û xwîrt ne da

## Navên deveran bi Kurdî çî ne?

Di diroka gelê Kurd de gelek tiştê wî hatine guhertin û windakirin. Wekî navê mirovan, wekî gelfê deşt û newalan wekî navê bajar û gundan. Dewleta Romî piştî 1946 li welat dest bi bijavtinê kir. Emê ji xwendevanên hêja re ji mîrgeha Merdîne navê gundê Kerceswê bi Kurdî û Tirkî binivîsin.

Kurdî  
Gelihe  
Êrdê  
Kefrê  
Kerkinê  
Êsê  
Binkêlbê  
Zêlîyê  
Dêrikfan

Tirkî  
Akbur  
Yamanlar  
Arica  
Koçak  
Gökçepinar  
Çukuryur  
Ulaş  
Nurlu

Bêcirman  
Hermês  
Bileqşê  
Sêyarê  
Batêlgiz  
Batêrê  
Borsinê  
Gêra Cahşêr  
Botika  
Botîje  
Berdahol  
Heyştwan  
Îzdara  
Xanika  
Bîrikê  
Bêdare  
Xirbê Merciya (Mezradır)  
Mezra Merciya (Mezradır)  
Xerabê Bene  
Derdilê  
Xirbê Smaîl  
Vergili  
Yakıtlı  
Dereci  
Aydınca  
Kutlu  
Batur  
Cevizli  
Altınoluk  
Yemişli  
Gurgan  
Poyraz  
Çalışkan  
Dereli  
Kaynarca  
Gözelöz  
Seki  
Gönülü  
Kavacık



şerê Cihana Yekemîn domdikir û Komara Tirkîyê damezirî, Kurd pir bi hêvî bûn ku heqê wan ê netewî were dayîn. Belê him dinyayê û him jî M. Kemal Kurd xapandin. Sozên ku ji Kurdan re hatibûn dayîn kesî nanî cih. Kurd jî di xwestinên xwe de ne pir bi qerar bûn. Lîberal fikirîn û lîberal meşîyan. Biryara qerara qedera xwe bi xwe nedan û ji mîletên din re hiştin. Rêxistinên ku ji bo heqê Kurdan li ber xwe bidin tune bûn. Yekîtiya Kurdan ne hatibû pê. Gelek kesên ku xwe berpirsiyarên Kurdan didîtin rolên pir xerab dilîstin. Ji bo van û gelek sedemên din, Kurd bi ser neketin. Kedxwaraj, ji bo ku Kurd dûre nebe problem û şerê azadiyê nikaribe bixwaze, êrişên Kurdan kirin. Di 1925'an de Şêx Seîd rabû û xwest rewşa Kurdan baş bike. Demeke kin bi dijmin re şer kir. Lê, ji bo gelek sedeman bi ser neket. Şêx Seîd û gelek hevalên wî li bajarên Amedê hatin darvekirin. Di 1930'an de li çiyayên Araratê şerê berxwedanê û di 1937-38'an de Serhildana Dersimê

bû ber xwe û nekiribûn program xwe, berxwedana wan jî pir sist bû. Zû westîyan, zû tirsîyan û zû revîyan. Di dîroka welatê me de, her ku dijmin radihêje çek, û êrişê însanên me kiriye, rêxistinên me belav bûne û revîyane. Lê, li dij dijmin nikaribûne xwe biparêzin û ne xwestine jî, doza xwe ya teorîk bi jiyane bixin.

Lê îro berxwedaneke xwîrt û sîstematik heye. Serhildan û şerê gerilla dewletê dihejîne. Ev berxwadan û şerê îro ne tenê li heremekê, welatê me xwîrt e. Lê belê, li her cihê li hemû bajarên û zîndanên ev rabûn û berxwedanên 7 salan berê dest pêkir, roj bi roj gelê Kurd xwîrt dîke û ber bi yekîtiyê dibe.

Bê berxwedan û bê bîr û bawerîyeke xwîrt û bê qerar şerê xweparastinê ne mumkun e. Azadiya gelan bi qeweta gelan bi xwe ve giredayî ye. Ew roj ne dîr e. Xweamedekirin (xwehazirkirin), dê wê rojê hîn jî nêzîktir bike. Rojnama "Welat" jî, ji bo vî armancê û vî rojê dê roleka girîng (muhim) bilîze.

## NÛDEM DERDIKEVE

Di armanca dagirtina valahiya şalan kovara hunerî, edebî û kulturî NÛDEM derdikeve!

Ger hûn dixwazin ji edebiyata Kurdî û ya dinyayê haydar bibin, nûçeyên nûh bibihîzin û bi demê re gava bavêjin, wê çaxê NÛDEM bixwînin! NÛDEM dengên nivîskar û hunermendên welêt e, ew bi pîrdengiya xwe, bi nûjenbûn û bi bedewbûna xwe ya çapê di nêzik de derdikeve!

Ji bo peywendî û danûstandinê:  
Firat Cewherî  
Gamlalandsv. 36  
740 41 Vittinge, Morgonqava-Sweden  
Tel : 224-61 428  
Fax : 224-61 428

## Leşker segên xwe kiş dîkin xelkê

(Çolemêrg) Li gora xeberên dighin destên me li herêma Çolemêrgê (Hekkarî) li gundê Aşûtê (Çiğlı) Qereqola leşker seg û kûçikan kiş dîke xelkê.

Li qereqolê 15-20 seg hene, kes newêrê di ber qereqolê re here. Gundiyên Aşûtê dibêjin "heta niha segan dev li gelek însanan kirine cara dawî segan jinek bi navê Suheyra Edîş birîndar kirin. Suheyra Edîş bi ducana ye û niha li Nexweşxanê ye. Textora newêrin raporê bidin Suheyra, ji leşker ditirsîn.

# Ji jinên li derveyê welat çi tê xwestin?

- **Bindestiya neteweyî û jêderên vê bindestiyê piraniya neteweyê Kurd û seranserê welat girtiye. Belê yên ku pişt wan şikestiyê û ji herkesî zêdetir di nav çerxa koletî û bindestiyê de hatine guvaştin jinên welatê me ne**
- **Mecbûriyet û zordarî jinan ji cih û warên bav û kalên wan diqetîne, bi dûr dixê û davêje tenişt û qeraxên bajarên Tirkiyê. Li van bajaran jin dibin nêçirvan û paleyên gepa nanê xwe**


## Hayriye Eyisan

Kurd di bin zordarî û çavso-riyeke giran de dinalin. Rewşa Kurdan kirêt û şermûzarkir e. Bindestiya neteweyî û jêderên vê bindestiyê piraniya neteweyê Kurd û seranserê welat girtiye. Belê yên ku pişt wan şikestiyê û ji herkesî zêdetir di nav çerxa koletî û bindestiyê de hatine guvaştin jinên welatê me ne. Jin di war û rewşeke xerab de ne û qirikehliya jinan bê qedar e. Texmîn bikin, jin mîna dayika gava ku nikaribe zarokên xwe hîmî zimanê xwe bike dê çi qasî dil bi keser û dilbirîn be?

Bindestiya gelê Kurd û bandêra vê bindestiyê li ser jinên Kurd ne ev bi tenê ye, ne yek û dido belê çendalî û bi dehan in. Mecbûriyet û zordarî jinan ji cih û warên bav û kalên wan diqetîne, bi dûr di-

xe û davêje tenişt û qeraxên bajarên Tirkiyê. Li van bajaran jin dibin nêçirvan û paleyên gepa nanê xwe û jiyan dijwar û bê wîjdan bi giş xezeba xwe berê xwe dide wan. Li vir bi demê re jin ji zarokên kezeba xwe çavtengiyên dikin û dikevin heyr û mitala xwarina kufletê mala xwe. Ma ka ji vê nexwestir û zortir?

Cardî yên ku malên wan li ber çavên wan dihêne hilweşandin, şewitandin û talankirin, dimînin li rastê û li gasînan, li ber çavên wan kur û keçên wan, mêr û birayên wan dihêne êşkence kirin, dihêne gulebarankirin yan jî bi komikî dihêne binaxkirin û gava evqas serpêhatî dibîneh ji kûraya hundir û dilê xwe brîndar dibin kî ne ji jinên Kurd pêve? Û di serdemêkê de ku civat û komikên hezar kesî bi navê xwe diaxifin û qedera



Jin di nav çerxa bindestiyê de hatine guvaştin

xwe girtine destên xwe, gelên Kurd mîna ku tu bi kêrekê bike çarperçe, perçe-perçe bûye û li her aliyekî bi awayekî ev perçe tete bombebarankirin û di demekê de ku jiyanê ne layiqê mirovan bûye para me, kî bi qasî jinên Kurd dikare darê şikestî be?

Bi rastî jî felaket û boblatên malbatî û neteweyî pêş jinan dibînin û êrîşê jinan dikin. Ev hinekî jî ji ber cihê jinan ye dîrokî û hinekî jî ji ber ku jin bêhtir niwênerayetiya jiyanê dikin, dihê. Ev rastî ji peyv û gotinên ketine nav xelkê jî dihê nasîn nemaze gava ku bele yan jî tifaqeq tê serê malbatan. Dibêjin: Bele li jinan digerin. Lewra mêr zarokên xwe dihêlin û dirin, jin nikarin mîna mêran bikin. Mêr dikare bi serê xwe here bajarekî û li wê bixebite, belê jin nikare. Mêr karên qirêj û ne layiqê mirovan dikare bike, belê ev ji jinan nayê û bi dest wan ve hîlnaye, şerm e. Jin zemina sekin malbat, ax û rêkûpêkiya welat e. Ji ber vê yekê bêwelatbûyî û gelemşeyî ji herkesî zêdetir dijmînen jinan in.

Tiştê ku îro li welatê Kurdan dibe ji bo jinan trajedî û malkambaxî ye. Kurdên Iraqê ji ax û ava xwe hilqetiyên û bûne mihacirên sedsala me. Ji van derketî û mihaciran, ji sedî 90 jin û zarok in. Me bi rojan ji rojname û weşanên Tirkiyê û cihanê rewşa wan bi çavên serê xwe dît. Qêrîn, şeperzetî û hawar hevarên jinên Kurdan di

wênayên dilherêş de bi laş û gewd bûn û bi mehan ji vîtrîn û caman daneketin. Îro jî ev wa ye. Pirsra Kurdan bûye pirsra jinên Kurd. Çi gava qala Kurdan bête kirin, yan jî li ser Kurdan tiştêk bête nivîsandin, teqez pê re jineke ku zaroka xwe girtiye himbêza xwe heye. Mîna jinên Kurd gerek ji îro û pê de em li hemberê vê rewşê derkevin û vê kirêtiyê êdî nema bipejirînin (qebul bikin). Divê em li welatê xwe xwedî dekrevin û vê sernizmayê ji nav xwe bavêjin.

Helbet jinên Kurd ne mîna berê ne û îro ketina nav xebata welêt. Rola jinan di serhildanên Nisêbînê, Cizîrê, Licê û Qulpê de deng daye. Jinên Kurd derketine pêş, îşaretên serketinê hildidin, ji kur û keçên xwe yên şehîd re dilîlînin û qij dikin nav çavên zordar û dagîrkeran. Lê ev pirs jî gerek bête pirsîn: Ji sedî çendê jinên me guhê wan li ser têkoşîna ji bo welatekî serbixwe ye. Bersiva vê pirsê ji bo me jinên Kurdan xwedî wate û maneyeke girîng e. Belê jinên me serhildanên mezin li dar dixin û bûne şervanên azadiyê li çiyên. Belê jinên me ku barkirine bajarên mezin çi qasî wezîfên xwe dihênin cih? Em li Îstenbolê mêze bikin, li vir gişt milyonek Kurd hene. Ev hejmar ji nifûsa çend welatên Ewrûpa mestir e. Ewrûpî bûne welatên azad û mîna turîstan tene Îstenbolê. Jinên me yên li bajarên mezin niştecih bûne guhên wan ne pir li ser cenga azadiyê ye. Pir kême, di nav nifûsa Kurdan de ne dilopeke

jî. Li vir karên qirêj û giran pişka me ketine. Mêr, bira û mirovên me westiyayî vedigerin ji kar. Belê ji bira dibe ku em jî xwedî welat in. Welatê me bi mercê ku serbixwe be dikare çendcarî li nifûsa îro mirovan bijîne, welatê me bê dar û bi xêr e. Heger hê derhe-ma mirovayeti û rûmetê li ba me ma be em divê berê xwe bidin welatê xwe. Em gerek hayîdarê welatê xwe bin û dilê me bi dilê welat re lêxe. Em wek Yekîtiya Jinên Welatparêz pêwîst e em xwedî helwest bin.

"Ma çi ji me dihê, em karin çi bikin, yên ku li welatê mane bila ji welatê re bi xebitin" û gotinên mîna van bi tenê bi kêrî dijmin dihên. Lewra em li ser axa welatê xwe hatin cîhanê. Rastî û rehên me li welat in. Wêbê û pêşeroja zarokên me jî li wir e. Bajarekî Tirkiyê çu carî nabin warên me û me berhimbêz nakin. Yekî Firansî dikare bête Îstenbolê, belê welatê wî cardî jî Fransa ye. Roja ser bi seriyê bê dê vegere welatê xwe. Em jinên li bajarmezinên Tirkiyê belabûne gerek rûwê me li welatê be û hişê me tim li xelkê me be.

Her vebirîn û qetlîameke li welatê me çêbibe gerek me li vir bixê kar û serhildan bi hêza me geş û gurr bibin. Ji bo vê jî di nav Yekîtiya Jinên Welatparêz de bicivin û herin cem hev. Em li ku de dibin li kîjan tenişt û qiraxa bajêr ketibin bila em ketibin, em divê hev bibin in kom û civatên xwe çekin û wezîfên xwe yên welatparêzî bînin cih.



Jin di welatê xwe de biyanî ye...

# Rewşenbîrî şikandina tirsê ye

● Ger mirov bi rastî demokrasiyê, serfiraziye bixwaze, divê bikeve nav meşa gelê xwe. Li derveyê vê meşê, ji bo Kurd û kesên Kurd ne demokrasi ne jî mirovatî heye

### A. Dikilî

Divê Kurd, berî her kesî jî, rewşenbîrên Kurd, xwe ji bin bandora (tesîra) demokrasiyên biyanî (xerîb) azad bikin. Demokrasi, mîna, ku bi her aliyan tê kişandin, nîne. Ew jî formeke serdarî ye, formeke dewletî ye; di destpêkê de li Yewnaniya Antîk bi cih bûye, paşê xwe mîna formeke dewletê daye nasîn. Ji ber ku, demokrasi li ser hin hîmên mirovatî reh berdaye, ji aliye tu kesekî li dij nayê rawestin (sekinîn), her weha herkes jî, ew kes û dewletên kirêt û xwînmij jî dixwazin xwe di forma demokrasiyê de bidin xuya kirin. Demokrasi li gora gel, netewe û dewletan şekil digre, ne li kêfa dilan.

Ger em li vê derê, bi berçavkên Welateyê Kurdan, çavkî bavêjin ser gel û netewa Kurd, ser Tevera Rizgariya Gelê Kurd û pêşveçûna bi giştî, emê bibînin, ku demokrasiya ew pêk tînin, hê li pir dewletan jî tune. Kesek nikare ji qeweta xwe zêdetir, ji pêwîstiyên (ihtiyaciyan) neteweya xwe zêdetir; li ser rewş û

jiyana gelê xwe, bi hin ramanên fantazî (fikren xeyalpe-rest) bilîze, bixwaze giranbihayên Kurd, ku bi can û xwîna mirovên wî ava dibin, bixe bin bandora (tesîra) hîç û pûçiyên kesên din.

Gelek "rewşenbîr"ên "Kurd" hene, di nav çarçewên Ewropa, yan jî Tirkiyê de dijîn; li wir çî dibînin, çawa dijîn, dixwazin li (welêt) jî, li nav tevgera Kurd jî wisa bijîn. Rast e, mafê her kesekî heye, ku mîna mirovan bijî, doza demokrasiyemirovatîyê bike. Ev maf, li gora mafê gel be, ji bo netewe be, manekê dide, wekî din tu maneyan nade. Dibe, ku yek mirov bi tena serê xwe gihîştibe van mafan, jiyana xwe di nav jiyana gelê din de organîze kiribe, bi serê xwe pir jî pêş ve çûbe. Ger ew kes doza kesîtiyê li nav gelê xwe jî bixwaze ne neheq e; lê divê ji bo vê yekê bixebite, jiyana gelê xwe jî bilind bike. Rastî, demokrasi, jiyana serbilind, bextewer û dilberzî ew e, ku mirov jiyana xwe ya kesîti di nav jiyana gelê xwe de bihelîne, bi gelê xwe bixemile, li anegora gelê

xwe pêş ve biçe, li gor rewşa gelê xwe serfiraziye bixwaze. Îro, em dibînin, ku gelê Kurd di çî rewşê de dijî: Rabûye ser xwe, doza mafê xwe yê neteweyî-mirovatî dike, sazûmanên xwe ava dike, li hember dijmin bi canê xwe diwarekî pêk tîne; bi serokatiya xwe gav bi gav ber bi serxwebûnê ve dimeşe. Ev meş meşa azadiyê ye, meşa serxwebûnê ye. Ger mirov bi rastî demokrasiyê, serfiraziye bixwaze, divê bikeve nav meşa gelê xwe. Li derveyê vê meşê, ji bo Kurd û kesên Kurd ne demokrasi ne jî mirovatî heye. Divê di serî de rewşenbîr têtbigîjin (fam bikin), ew netewa xwe pêş ve bibin, ne ku, li ser têtgoşîna gelê xwe paldayî, ji aliye li dij bin yan jî fantaziyan demokrasiyê bikin. Ger rewşenbîr têtgîştibe (fam kiribe), mafê gelê xwe bizanibe, bi dilovanî-dilsozî bixwaze pirsra neteweyê Kurd çareser bike, wê bê qeyd û bê şert ronahiya xwe berde ser gelê xwe, bike-

ve nav meşa neteweya xwe, ber bi azadiyê ve bimeşe.

Em hin tiştina divê ji bîr nekin: Îro em, ewên xwe rewşenbîr dibînin li paş neteweyê Kurd mane, bûyerên welatê xwe, rabûna gelê xwe têtagnîjin (fam nakin), dixwazin mîna berê doza kesîti û grûpî bikin. Rewş ne mîna berê ye; êdî gelê Kurd serokatiya xwe dîtiye û yekcan rabûye ser xwe, tu mane û heyînen daxwazên me yên piçûk, hîçepûç nemane. Divê em êdî bibînin, ku bi vê rewşa ku em tê de ne, wê Kurd qebûl nekin. Gelê Kurd, rewşenbîrên li dervayê meşa wî ya azadî gazelan dixwînin, bê bingeh dihêle, tu qiymetê nade wan. Ger mirov xwe rewşenbîrê gelê Kurd bibîne, divê li gora zagona (qanuna), ku gelê wî daniye, li gora demokrasiya, ku gelê wî tê de ye, bimeşe, ne li gora yên kesên din, ne bi fantaziyan (xeyalan).

Pêvajoka îro em tê de ne, ji me gavên bêtirs dixwaze. Divê em dev ji gilgizanan berdin, li

gor karînen xwe aliye ji têtgoşîna (mucadela) gelê xwe bigrin û pê re bimeşin. Kes ji kesî, ji karînen wî zêdetir tiştêkî naxwaze. Ger zarokên Kurd bi metirsî kevîran davêjin leşkeran ger dayik, keç û xortên xwe bi destên xwe dişînin ji bo cangoriya welat, divê rewşenbîr jî bikaribin bibin ronahiyekek ji bo welatê xwe, li ba gelê xwe, bi gelê xwe re, Tiştên ji xwe re dixwazin ji bo gelê xwe jî bixwazin. Gelê me di nav demokrasiyê de najî, ku em demokrasiyê wer fireh bi dest bixin. Demokrasi, rewşenbîrî, şoreşgerî, welatparêzî ew e, ku mirov bikaribe bi gelê xwe re pêş bikeve, li dijî zordestiyê bi keç-xort û zarokên xwe, bi hêzên xwe bimeşe.

"Her netewe, ku dixwaze li ser rûçikê dinyayê cihekî wî hebe, divê ceng bike! Ev qafda siruştî ye, ku nayê guhertin. Zagona kîmyewî, nebatî, heywanî ya bê hempa ew e: Têtgoşî, şerkirin!.." (Dr. Vet. M. Nûrî Dêrsimî).


## XAÇEPIRS

Amadekar: Nijad Yaruk

### ÇEPERAST:

- 1- Sloganê rojnameya Welat / .....ê Kerr, Bavê Erdal İnönü.
- 2- Ê ji xelkê Azerbaycanê / Qedexa / Kirîvên, Kurdan, yên terqa wan rabû.
- 3- Sembolê iterbîum / Giranî / Navenda belavkirina ceryanê/ Sembolê Lityum / Cînavkê yekemînê pirhejmar.
- 4- Dîne Mehemed / Ji Misra Kevn îlahek / Bûyîn.
- 5- Feylesofek ji Yewnana kevn / Nivîskarê Welat, zimanzan / Plaqa Lîtwanya.
- 6- Belavbuyî / Bi Erebi ez / xelk.
- 7- Ji nivîskarê meşhur Şekspir tîpek qrala / Eziyet / Nebatek / Pirtûka Dawud pêxember.
- 8- Di hinek devokên Kurd de da, dayê / Ode / Şubhe, ihtîmal
- 9- Piştnavê xwediyê rojname Welat / Ji ber eşek ax kişandin / Mîtolojî, efsane.
- 10- Dîn, mezheb / Du tîpên bi deng, dayik ji bo zarokan razînin dibêjin / Di-kandar malê xwe li ser rêz dîkin / Navek jin a / Yên ku ji zîmanê Hind û Ewropî be.
- 11- Da, Çavkaniyên mê / Celebek zû nivîsê / Berhemên şîrî / Navek Yewnaniya.
- 12- Îstîsna / Sazkirin a dengên enstrûmanan / Payîtexta welêt.
- 13- Bankirina mêran / Teht, kevir / Ji bizav ketin / Sewal (heywan) ek.
- 14- Destvekirî, camêr / Navê qebilek ji çermorê Emerîka / Navê partiya Özal / Bi İngilîsî na.
- 15- Menzel / Benik / Yên ku ji bo armancek canê xwe dide, amadekan / Navekî ji a.
- 16- Nivîskarê Birîna reş, Lêkolînger, Nivîskarê welat / Baneşanên kêfên İspanyolan / Perên İspanyolan.

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20



### SEREJÊR:

- 1- Cînek çiçek / Dernek / Serhestiyên gulover.
- 2- Cînavka kesanê yekemîn / Sembola sîlîsyum / İlahek ji mîtolojiya Yewnana / Zarokên nêr, kur / Xiyanet, piranî ji bo kewan têtgotin.
- 3- Parlamenterê Kurd, nivîsvanê Welat, pîrek a Meh-dî zana / İxtiyar / Di notayê da dema seknê.
- 4- Li Sovyet a kevn navê bajarekî / Selahiye / Kurd ji bo Tirkan dibêjin.
- 5- Sembolê Titan / Ji cînsê kîzikan sewalek / Organek me / Navê partiya yên ku ji bo xelasiya mîntîqa bask tekoşîn dîkin.
- 6- Yên ku ji çiçekan difurre / Bi Erebi bimbar / Payîtexta İranê.
- 7- Rukirinek ji bo metalan / Eziyet / Cejn.
- 8- Dîrokanê Kurd, nivîskarê Şerefname / Ji quranê ayetek / Emê sewalan, li hinek ciyan ceh jî têt

- gotin.
- 9- Menê perê Elman / Xwestin / Gede / Serma.
- 10- Eks, înad / Bend, memnû / Ore ora sewalan.
- 11- Vîde / Arîkar / Sazumana lêkolîngerê jîndeyên ku ji dervayê dinyayê hatine.
- 12- Dewamî / Cînsê jehriyê / Bi Erebi bajar.
- 13- Sîhîr / Qalind xwendina tîpek Kurdî / Vegerandin.
- 14- Roja ku tê dijîn / Sazî / Di metabolîzma însên de hîmên çêkerên bingeh.
- 15- Sembolê Samaryum / Notayek / Rayî / Gopal / Nivîskarek Kurd yên kevn, mewlud nivîsiye / Di terzîtiyê de biwêjek.
- 17- Cephe / Kin nivîsîna koma mîletan / Eger.
- 18- Bê av / Kînnivîsîna gram / Navê çiçekekê.
- 19- İtîmat / Sembola renyûm / Mîhengaceryanê.
- 20- Cîvakanê mezin, nivîskarê welat / Li Tirkiye navê ajanseke xeberan.



## DERKETÎNA ME NE DÛRE





**NEQUŞK**

Amadekar  
Aram Cem



Metinger, berî ku welatekî  
bindest bikin, mêjyê miroven  
wî welatî bindest dikin

Ismail Beşikçi

**Înönü hêdî hêdî dişemite**

Heya berî çar-pênc meha xelkê Erdal İnönü wekî din dizanibû. Rektoriya ODTÜ di dema Deniz Gezmîş de kiribû. Alim, sergirana û demokrat sifatek wî bûn. Di afîş û sloganên hilbijartina (seçim) dawî de jî ew aliyên wî anîbûne ziman: "Ê cihê ew e! (Farklı olan o)". Lê piştî ku SHP ji sindoqên hilbijartinê, partiya sêyemîn derket, İnönü jî hate guhertin.

Guhertin li meclîsê destpêkir. Di sona mebusan de Leyla Zana û Hatib Dicle li ser zordestiyê sekinîn û biratiya gelên Kurd û Tirk bi kurtî anîn zimên. İnönü wek patronê xwe Demirel jî peyvên demokratîk ne kirin. Di kêlîkekê de got "Ev herdu mebus dê îstîfa bikin" û di mehek du mehan de dane îstîfa kirin.

Pişt re bû şîrkê koalîsyonê. Bi Demirel re hikumet çêkir. Bû wekîlê Demirel. Bi tujikên MİT ê û ordiyê dest bi



vê terora dewletê nabîne û parastina gelê Kurd bi terorîzmê nav dîke. İnönü hêdî hêdî dişemite

13 ê sibatê polîsên İstebolê senaryokek çêkirin. Du mîlîtan girtin. 12 kuştinên ku nehatine ronahîkirin xistine sukra wana de. İnönü paltoyê xwe avête ser milê xwe û beziya çû Wezîrê Karêhundir İsmet Sezgin û polîs pîroz kirin. Ev çî ker e, ev çî kurtan e. Polîs dimeşin. Di nava bajarana de kolanan (cade) digrin û bangdidin: "Xwîn bi xwînê!" Li dinyayê, li kîjan dewleta demokratîk meşên wiha çêdibin û li kuderê wekîlê serokwezîrekî bi ser ve rewşê re diçin polîsan pîroz dikin?

Înönü bi her tujikî re qamêkê radibe. Di her rabûnê de ji wê kesîtiya xweyî demokratîkî tiştekî wîna dîke. Bi vî awayî here em ditirsîn ku piştî 2-3 salî din ew jî bibe weke Bülent Ecevit.

Hun çî dibêjin?

vê terora dewletê nabîne û parastina gelê Kurd bi terorîzmê nav dîke. İnönü hêdî hêdî dişemite

13 ê sibatê polîsên İstebolê senaryokek çêkirin. Du mîlîtan girtin. 12 kuştinên ku nehatine ronahîkirin xistine sukra wana de. İnönü paltoyê xwe avête ser milê xwe û beziya çû Wezîrê Karêhundir İsmet Sezgin û polîs pîroz kirin. Ev çî ker e, ev çî kurtan e. Polîs dimeşin. Di nava bajarana de kolanan (cade) digrin û bangdidin: "Xwîn bi xwînê!" Li dinyayê, li kîjan dewleta demokratîk meşên wiha çêdibin û li kuderê wekîlê serokwezîrekî bi ser ve rewşê re diçin polîsan pîroz dikin?

Înönü bi her tujikî re qamêkê radibe. Di her rabûnê de ji wê kesîtiya xweyî demokratîkî tiştekî wîna dîke. Bi vî awayî here em ditirsîn ku piştî 2-3 salî din ew jî bibe weke Bülent Ecevit.

Hun çî dibêjin?

**Demirel û Kurdên Başûr**

"Mûsil ji destên me derneketiba niha ew jî dê yên me bûna."

Demirel

Li vir mebest jî, "ew jî" Kurdên Başûr in yanî Kurdên Iraqê ne

Vê peyva Demirel qerfêke Kurdan anî bîra me. Dibên yek li navê yê din dipirse. Yê din:


- Navê te çî ye?
- Navê min Şêxo ye.
- Rêxo, navê bavê te çî ye?
- Te navê min kir qurs, ma dora navê bavê min.
- Ev jî mesela serokwezîrê me Süleyman Demirel e.
- Em Kurdên Bakûr xerîqîn ma dora yên Başûr...

**Mîna çîroka sê meymûnan nabihîsi nabînin nizanin**

Serokê MÇP Alparslan Türkeş zulma ku li ber çavên wan li di qebûlkirina heyeta Kibrisê de Kurdan tê kirin re girtî ye. Wek wiha dîgo:

"Berê ji ber ku me yekîtiya komarên Tirkî dixwest, herkesî ji me re di got Turancî. Niha herkes bûye Turancî".

Türkeş neheq nîne, ji şovenîstan heya partiye wana ku ji bo mafên civakî hatine danîn hemû bi hev re ji bo vê armancê dixebitin. Îro ji yên wek Ecevit bigire heta ku doh ji xwe re digotin sosyalîst, di vê rewşê de ne. Lê belê guhê wan ji



zulma ku li ber çavên wan li di qebûlkirina heyeta Kibrisê de Kurdan tê kirin re girtî ye. Wek wiha dîgo:

çîroka li ser sê meymunan ew jî nabihîsin, nabînin û nizanin.

Sosreta giran ew e ku Kurdekî me jî bûye Turancî!. Îro ji bo vê armancê ji herkesî bêhtir xweydan dirêje û xwe helak dîke. Em bawer in ku di dîroka Tirkî de wê navê Hikmet

Çetin jî bi tîpên zêr binivîsin, wek apên wî Diyab Axa, Cemîlê Çeto, ku em bînin îro Kamuran İnan û yên wek wan...

**Dereng jî be baş e**

"Li Tirkîyê hereket û tevgerê Kurd heye û ev demek e bûye pîrsa yekemîn û serêkî. PKK heye, HEP heye û di nav SHP de HEP î hene... Ev giş hene û her roj rojnemeyên rojane pelên xwe bi van dixemilînin... Belê çend ji me zannin bê bi rastî Kurd çî dixwazin... Ne kes. Bi tenê hin tişt li ber guhê me ketine. Ez dê ji îro û pêde li ve pîrsê bikoim."

Murat Belge

**FARQÎN**

**"ZİMANÊ KURDÎ ZİMANÊ ME YE"**

Vokal: Koma Serdîlan

Belavkirin:  
Elmas Müzik Üretim  
İMC 6. Blok No: 6633  
Unkapanı / İstanbul  
Tel: 528 55 50

**TÎR**

Musa Anter



**Fato**

Î ro welatê me bûye erdê gundekî. Ax axa wî gundî ye, lê dibên ev erdê Hemo ye, ev yê Hiso ye, ev yê Biro ye û ev jî yê Silo ye.

Îro axa welatê me ketiye ve rewşê. Wek perçe welatê me yî Sûriyê, yê Iraqê, yê Iranê û yê Tirkîyê. Berê Sûriye û Iraqê wek îro ne di bin darê Ereban de bûn.. Sûriye Fransîz û Iraqê jî İngilîz bû. Ev herdu mîlet, erê xwînîj in lê ê ku xwîna wî dimijîn pêşî bi derziyan pûç dikirin, paşê xwîna wî distandin. Ji ber ve yekê feqîrê xwînda, bi êşa xwe nizanibun. Lê yên Tirkîye û Iranê, bi gwîzan û hicaman xwîna Kurdan dikşandin.

Ji ber ve yekê Kurdên Sûriye û Iraqê jî yên Tirkîye li pêştir bûn. Ku carna ji Sûriyê û Iraqê mêvanên me dihatin me ji wan re digot: Lawo bine bê Kurdên Sûriyê û Iraqê çî qurrene.

Wext derbas bû, salan da pey salan, Kurdên Tirkîye jî bi xwe şiyar bûn. Di wexteke kin de êdin em ji wan bihurtin, ez nizanîm lê belkî niha îca Kurdên Sûriyê û yên Iraqê jî me re dibên qurre.

Di tarîxa İnsanetiye de çar sefhe hene. Beraberê insan wek heywanan yek yek bûn, a duyemîn bûn bavik, a sêyemîn bûn eşîr, a çaremîn bûn mîlet. Ê xwiyaye ferd, bavik, eşîr tim neyarên hevîn. Ev paşdemayî û çiyayîya me ku em piştî xelkê mane ne sucê me ye, xelkê em wiha hiştin.

Niha li Iraqê Kurd hîn eşîr in wek Barzanî, Talebanî û Zibarîyan. Berê em li Bakurê Welat jî wiha bûn. Lê îro ez dizanim, em Kurdên Tirkîyê êdî bûn in mîlet. Pêşveçûna me ji Iraqê jî ve tê. Em bûn mîlet ew hê eşîr in.

Îro, kes nabêje bijî Omerya, bijî Rema, bijî Surgîçî, bijî Hesen û Heyderan, dibên bijî welat. Ezê niha dîtinek xwe ji we re bêjim. Berê li gundê me gava yek ji gundekî tenîştê me di nav mayînan de dihat kuştin, temamê dora wî dîgo bi tehtil erda wî kiriyê. Lê ewa ku min dît êdî ez hîn bûm ku, Kurdên me êdî ne yên berê ne. Yanî bi tabîra berê qurre bûn e.

Ez li gund bûm, rojekê min dît pîrekek feqîr gundiya me Fato pêşmalka li ber çavên wê ye û firçe firçe wê ye digrî. Ez tirsîyam, min got belkî zarokên wê ya mirine yan jî şehîd bûne, min got: Fato lawo xwedê neke ev çî hal e. Fato:

- Ma xalo te ne bihîstiyê?
- Na lawo.
- Ma ne dibên li aliye Hekariyê du zarokên me şehîd bûn e.

Piştî ve dîtina xwe min qenc yeqîn kir ku Kurd şiyar bûne. Wekî Fatoya Stîlî li ser şehîdên Kurdan, yên nenas digrî, êdî ev îş tamam e. Çiqas min divîbû ku wê çaxê Kozakçioğlu jî li ba min ba. Ez yeqîn dikim êdî wî jî nema zart û zurt dikir.

**Xwediye malê êdî şiyar bû**

Di sala 1948'an de li İstebolê min "Dicle Kaynağı" derdixist. Li İstebolê û li welêt bûbû ecêbek. Temamê hikûmetê û zîlamên wan li min radibûn ser lingan. Hema her meh ez dibirim emniyeta İstebolê û eziyet didan min. Bi pîrî wiha ji min re digotin: Kuro ma tu çî yî, em karin serê te biperçiqînin û bi rastî jî ez gêrî erdê dikirim û pêl serê min dikirin. Lê cardî jî ez ne disekinim. Carekê ji wan caran ku ez berdama, min di rojnama xwe Dicle Kaynağı da ev mesele nivîsî. Mesele wiha bû: Rojekê du diz ketin malekê, mal feqîr bû, jin û mêr xebatkar bûn. Bi dizan jin û mêr şiyar nebûn, lawkê wanê penc-şêş salî bi dizan şiyar bû. Dizik hate ser lawik, kêra xwe kişand û got: Kuro binêre deng ji te derkeve ezê te bikujim. Dizê din jî sindoqa diya lawik vekir û fotak danî û firaxên diya wî û malê paqij kirin nav fotê ku bibe. Nava lawik dişewitî, lê kêr jî di ser serê wî re bû newêribu deng bikira. Lawik wiha fikirî got, avnê, avnê, avnê. Dizê bi kêr got hiş kuro ezê te bikujim. Dizê din go lawo zaro ye, tirsîyaye avê bidyê. Diz tasek av da lawik. Lawik bi deng ew tas giş vexwar, cardî jî dê û bavê wî şiyar nebûn. Êdî lawik piştî vexwarina avê bi şid got, oftan, oftan, oftan, disa jî bav û diya wî şiyar nebûn. Lawik ji nuh ve got, oftan, oftan, dizê bi kêr go hiş kuro ezê devê te bişkinim. Li lawik ne xistibu lê belê car dî jî go, ay devê min, ay devê min, ay devê min. Piştî vî dengî şiyar bûn û diz revîyan.

Min wiha jî gotibû, erê ez wek wî lawikî me, kêr di ser serê min re ye û ez zaro me. Daxwaziya min ew e ku ez diya xwe û bavê xwe şiyar bikim. Ku dê û bav şiyar bûn wê diz birevin. Diz çiqas bi qewet bin ku xwediye malê şiyar bibin rev ji dizan re dimîne. Min zanibû ku ez wek wî lawikê bin kêrê û belengaz im. Niha ez dinêrim ku dê û bavê min şiyar bûne, êdin muheqeq wê diz birevin û ezê jî çek û malê diya xwe xelas bikim.

# "Hukmatî pîron vit ward çiyekî nêverda"

J. Espar

8'ê sibata 1925(1) di, Pîron di ver a Hukmatî tîfingo verê teqa. Ebi teqayîş bê inê tîfingî, serehewenayîşê Kurdan dest pey kerd. Kirdî (Dimilî, Zazay) nê serehewenayîşê xwi ra vanî. "Herbê Şêx Seidî." Gege hîna zîkîr kenî, vanî "Herbê Şêx" 1925 ra inheta 67 serrî vîyartî. Derhekdê Herbê Şêx di hetanî nika zaf çî amewo vatîş û nuştîş. Dewletî inê peldê tarîxdê ma ser o gorê bê îdeolojîdê xwi nuşt, da nuştîş û vîla kerd. Çiyê ki ina ware di dewletî nuştî ya zî vatî, "kê zaf asan şênî vajî, zur î, neqe yî."

Eyrû raştey herbê Şêx Seidî, vera vera vejêna meydan. Dokumantê ki qulan di nimiteybî, yew bi yew kuwenî destandê wendoxan. Tayn roşanbîrê erjîyayey xwi nê girwan ser dejnenî, xebe tenî. Ma ewro zanî, organîzasyona ki waştî nê serehewenayîşî îdare bika kam a. Serek û lîderanê Herbê Şêx Seidî ma şinasnenî. Ma zaf rind zanî, Herbê Şêx Seidî çîrî vejîye û xayey jey çî bî. Ma nê lej di, kemananê ma Kurdan zî zanî. Labelê, zaneyîşê ma hewna zî gelek toy o. Semedo ki kê bişî Herbê Şêx Seidî, heme hewna ra anlîz bikî, xebat lazîm a. No ware di tayn girwey estî ki herkes şeno biko. Mesela welatê ma di, hînzaran reyra mêrdimî, şadey nê herbî yî. Beno ki zafîney ineno mardî, labelê kê bawer kenî ki qorê hema ra zî weş î. Kê şênî nê mêrdiman persî, gelo yîni derhekdê na mesela di çî dî, çî eşnawit. Vatîş û diyayîşê yîni, şeno bibo dokumantdo bol erjîyaye. Tarîxê milletan biney zî, inhewa nusêno.

Herbê Şêx Seidî ser o yew cenêka pîranî yew qasetî di qalî kerdî. Ya bi xwi emrê wxe nêzana. Labelê qalkerdişê yay ra fem beno ki emrê yay nûzdî 90 serrî yo. Ez namey yay zano û yay rind şinasneno. Yay qasetî di se vato se, mi zî eynî ay hewa nuşt. Ez namey yay nêdanî. Cenêka pîranî, inhewa dest bi qalondê xwî kena:

"Ez newe zevacaybo. 12 rocê mi qeday bî. Ma peyhesay va: Eşqey omey key Mehmedê İsmailî pir bî. Eşqey eyelê işikî dêreyî(2) î ha key Mehmedê İsmailî di yî. Omay Hukmatî di qewxe kenî."

Hukmat şono dorwarey bonî gêno, eynî eşqon tepşo. Hema senê Şêx Evdirihim(3) pey hesêno ki zeftîyo dormey bonî girewto eşqon tepşenî, şono pey ber di comî, millet ra vono:

- Hucim, hucim, hucim!..

Ay eşqey zerre ra panonî, dewicî teber ra panonî. Ewra di hebî zeftî birîndar benî, ay bîni zî remenî. Ay birîndaran ra yew ma ard û yew zî Ehmedêy

çepoy bard. Welhasilî kelom ma birîndar ard keye. Ma dî va:

- Şar dew ra(4) wardono. Ma va:

- Qeyî?

va:

- Hukmat yeno millet pêrû tê ra pêşeno û beno kişeno.

Herkes warişt, xwi rî key xwi ca varda û eyelê xwi girewtî yabon kewtî. Ma şewa verên, çî xwi reyra nêbard, ma şî Quldey cêrên. Ma tena şî. Ma biney ronîştî û omey keye. Bi nimac,

mêrderê mi va:

- Zonî dew

pêrû şiy.

Ay birîndarî

ra zî, ma vonî:

- Ti senê nî?

Birîndarî nalin darg karda. Mêrdey mi zî vono:

- Ez in birîndarî weye ko, Hukmat ma ra çî nêvono.

Nomey birîndarî Sidiq o. Mêrdey mi çiqas vono: "Sidiq."

Sidiq vono:

- Hiiin, hiiinn. Sidiq ti senê nî?

Yo nalen o. Mêrderê mi va:

- De wardi, ma wardî! In teres ha mireno. İnkey bêrî, ewta marde veynî, hewna ma rî zîrar o. Ma bizonî nê mireno, ma ka nêşerî.

Ma wariştî, herê xwi girewt, yew purcuney belxulî, yew purcuney kesmî, yew pelas, yew leheyf, ma herdê xwi sar na, ma goliki ca varday mongay xwi girewt şiy. Ma şiy, şiy Kormig.(5) Ma şiy kormig ki key perdê min û dapîra hem yê zî ha weyra yî, ma yîni resay. Milletî va:

- La ma Kormigî di vindî se kî? hadê me wenî.

Ma şiy, şiy, şiy Eynî pîracmonî(6). Eyleko va:

- Bêrê ma, derey şer ro vecî, şerî tonegragî(7).

Eylendê ma ra ay laco şinikî hema gi xwi ro kardinî. Laco bîni zî, hema timonî û yew îşlig pira wo. Keyna ma zî, hîni des serra ya. Mi laco şinik î warez mi zî laco bîni vegrewtibî û mêrderê mi zî destê kevnardey ma girewtbî. Şewa tarî ya. Ma eyniwo sipî ra vîyartî, ma yabon kewtî. Kelmel çinî yo. Yew herî ma wo. Ma şî Tonegragî. Ma vonî: "Zilfî Cehfirî

zorlî yo. (?) Kinarî Hukmetî yo. İna dewey yê ya.(8) Hukmat ma ra çî nêvono." Elî Şerîfî, Ehmedê Şerîfî, Dat Hes, Dat Sef, key pêrdê mi, çiki dewi esta, pêrû ha weyra yî. Ma zafî. Ma çend keyey şiy key Eysdey Eboy. Elî Şerîfî û Ehmedê Şerîf şiy key Eysdey Dewrêşî. Toy şiy a mehla daştênî. Ma ay keyon a vilabî.

Da des rocî, ma weyra bî. Ma peyhesay va: "Esker pêrû omewo Pîron û hewna pîron ra

mi reso. Yew çîwa mi ro pîştî. Va:

- Herê, ti sera şêra.gonî ti bêra. Di ageyri, bê lez!

Ez ageyrawo, omeyo keye. Key ma senêhewa ma tira vecay, ay hewa wo. Birîndarî nêvardawo Hukmat qarîş bo. Vato:

- İn keyiy ra nêbînî ez Mardînî. Yîni ez weye kardo.

Birîndar çermig(9) ra bi. Namey yê zî Sidiq bi. Key ma tîp temom bi. Yew kîlimi, yew

kardinî. Kom kinarê Şêx bibînî Hukmatî tepîştîni. Xocê Mehmu, Alla rehmet kû, Misfay Huseyn Axay(11), Behrî Mehmedê İsmailî inê toy bardî Xarpêtî di xeneqna. Ehmedê Huseyn Axay bira serey yê dere kard. Şêx Seid Efendî Diyarbekî di xeneqna. Şêxî kîştî. Ayê ki remay xelasay. Ehmedê Şerîf(12) û Elî Şerîfî surgun di mardî. Zilfî Cehfirî yê raykardî. Zaf surgun di mardî.

(1) Hewawo ki, M.V Brunessen, Nurf Dersimî û Kadîrî paşa(Zinar Silopî) nuseni, serehewenayîşê Şêx Seidî 8'ê Sibati 1925 di, dest bere kerdo. Ebi gore bê Ekrem Cemil Paşay zî, rojê destpeykerdişê serehewenayîşî, 13'ê Sibati 1925 o.

Bewnê, M.V. Bruinessen- Axa Şêx û dewlet, Nurf Dersimî- Tarîxdê Kurdistanê di Dêrsim, K.C. Paşa- Dozey Kurdistanê, E.C. Paşabi Klimey Heyatê mi (Muhtasar hayatım, Brüksel Kürt Enstitüsü, Eylül 1989)

(2) Nê eşqey ki ya behs kena inê yî: Meheme İsikî, İsmet İsikî, Hesikê Elîkî, Şeweş Mehmedî, Welî Hedîki û Hesenê Bêz bî.

Bewnê, Malmîsanîj, Şêx Seidî Hame Pîron, Kovara Hêvî-Paris, homar 4,1985.

(3) Şêx Evdirehim biray Şêx Seidî yo. Malmîsanîj derheqdê aqibetdey Şêx Evdirehim İnhewa nuseno: Şêx Evdirehim, Herbê Şêx Seid ra pey gelek zeman binê xefî (Suriya) di moneno, di ma ageyreno Kurdistanê Tirkiya. labelê eskerê Tirkan nîzdî Bismilî di, salat di Şêx Evdirehimî û embazanê yê ca kenê û ayca di yîni xelî miyan di gan bo ganî veşnenê.(gore bo ki Hesen Hîşyar nuseno, Şêx Evdirehim û embazê xo Hezîrana 1937 î di kişiyayê) Bewnê Malmîsanîj "Zewncê Çimebelekî" kovara Armanc, Adar 1989.

(4) Dew ra qestê yay, Pîron o. Pîron (Dicle) yew qezay Diyarbekir a.

(5) Kormig: Yew dewa wîrdêk a, zaf nîzdî Pîrani ya. Yew mehleday Pîron ra besta ya.

(6) Pîracmon: Yew dewa Pîranî ya. Dewletî namey jay kerdo, Kurşunlu.

(7) Tonegragî: ina zî yew dewa Pîranî ya. Dewletî namey jay kerdo Kayî.


(8) Hewawo ki cenêki vona, Tonegragîdewey Zilfî Cehfirî niya. Labelê Tonegragî Babdey (Eşîrdey) Eliyon ra yî. Zilfî Cehfirî zî a bab ra key Cehfiran ra wo. Babel Eliyan zaf hera ya. Zaf şaxî na Babî estî. Nê şaxan ra vanî key, Mesela, Key Kosî, Key Elî Şewqî, Key Cehfiro....)

(9) Çermig: (Çermik) Yew qezay Diyarbekir a.

(10) Culbeynî: Culbeynî zî yew dewa Pîranî ya, Dewletî namey jay kerdo Kûpetaş.

(11) Musfay Huseyn Axay, Babdey axan, ra wo. İna Bab zî gelek hera ya. İna Bab zî hezey Babdey Eliyon zaf şaxê jay estî. Mesela, Musfay Huseyn Axay û Ehmedê Huseyn Axay, Key Pîrzeyd Axay ra yî. Sewbîna şaxê jay zî estî. Mesela: Key İsmail Axay, Key hesen Axay, Key Elî Axay....

(12) Ehmed û Elî Şerîfî Babdey Eliyon, Key rosî ra yî. Ū biray cê yê. Peyhesiyayîşê ki ez peyhesiyayo, inê wîrdî biray, Denizli di surgun di mardî.



vecawo. "Keko Mehmedî qatirey xwi girewt ome pîron. Ezî reydi omewo. Ma şiy key keko Mehmedî yîni. Mi va, ez şero key ma zî veyno. Mi dî, berdê key pêrdê mi var di, mêrdey mi, mi ver o veca. Mi ra va:

- Ti çî geyrena?

Mi va:

- La keko mehme ome, ez reydi omewo. Mi va, hey çiy ma se biyo?

Yê va:

- Herê, mi wardey çiy na wo. To ser o nêbînî, qey cay Hukmatî se kardo mi? Ez topal, feqrî û seqet o. Qey kom mi ra çiy vatîni? Ez ka xwi rî keydê xwi di roşo. Mi çîrî key xwi raşonaynî? Semedê to, ez wariştto yabon kewto. Ti çî omeya Tonegragî ra? Willay ez to kişeno.

Ez yê ra ver, yo mi ra dimi, ez yê ra ver, yo mi ra dimi, ma şî berdê ma ra vîyartî. Nîşaynî

Ma omey Culbeynî(10)de şewî zî, ma weyra mendî. Tira pey ma omeyî keydê xwi. Ma omey keye çîray çiyek çinî yo. Ne tasi esta, ma tira çiy borî, ne zî koçik esta. Xilê ma, qutiye ma, yukê ma pêrû tê şikişî. Veşnayî, tonayî. A zibil zebaley yîni, gemarey yîni, ha zerey keyî di a. Ma gemar-memarey yîni eyşt. Newerna xwi rî bon tira da tede ronîştî. De çiyekî çinî yo. Ay di qatî nivîno ki ma xwi di bardbi Tonegragî, ma ay nivîn hewna ard û tede rakewtî. Heze ki kê xwi rî newerna keye bikî.

Ay eskero ki pîron di mendbi, firaqê şarî bardbi û hewna rotinî. Ma ki omey bindê bono, Hukmatî ko ra ki yew biney pîl bi, yew zonaye bi, bardinî kîştîni. Zilfî Cehfirî kom ra celaynî, vatîni: "İno kinarê Şêxî yo" û hukmat şîni tepîştîni, surgun

# Folklor Botan



## Beşir Botanî

1. Pahîzok  
Hestên evîni û siyasî ne,  
xêzmişe ne, awazên wan bêhtir ji  
oktavekê ne (heşt deng) û çar  
corên (texlîten) wan hene.  
A- Pahîzoka koçerî  
1- Miqam, weke Gelyê Tiyarê  
2- Peste, Diyarbekra Şewitî  
Hewkirina wan li ser miqam  
Beyat Kurdî (nimûneyek)  
Fa mî fa re, yan fa re  
A- Pahîzoka Koçerî  
1- Miqama Gelyê Tiyarê, Be-  
yat Kurdî  
Di rêwo, di rêwo, di rêwo, di  
rêwo  
Şewir û civîn girêdane li, En-  
qerêwo  
Heçî qolqomandarê Xaîn bibê  
li doza Gelyê Tiyarêwo  
Em ê nîşanên wan ji milên  
wan bikin, berê wan dine Diyar-  
bekrêwo li ser sifra xwînêwo.  
ûhd..  
2- Pesteya Diyarbekra Şewitî,  
Beyat Kurdî  
Dinya ava bû li Botan Diyar-  
bekra Şewitî Lê  
Lê îroke bûye wêran Diyar-  
bekra Şewitî lê. ûhd..  
B- Pahîzoka Dêmanî  
3- Miqam, Weke Şahîno,

Heyran jaro  
4- Peste, weke Ez Xelef im,  
xelef im  
Hewkirina wan li ser miqam  
Beyat Kurdî (nimoneyek) Fa mî  
rê.  
B- Pahîzoka Dêmanî  
1- Miqama Şahîna, Beyat  
Kurdî  
Şahîno  
Ez ê Deşt Botan da bêmo pa  
nê dibêjnê wa bi texta  
Te pişt xwe girêda bi qayîşa  
û zêde barî van rexta  
Dest bavêje çingilê min, mo-  
minê min bigre, min bibe zaxoka  
Behdînan cihê xweş mîran û  
zêde barî mîletê wan mişexta  
Hay mala min, hay mala babê  
min Şahîno. û hd..  
2- Miqama Heyran jaro,  
Ecem  
Heyran jaro  
Ez ji kul û derdên te dimirim  
hey hay hey hay  
Çavên min reş in kilê Sibhanî  
nagirin, jaro  
Heçî yarên wan bi kêfa dilê  
wanbin  
Ez sûndan dixwim bi Şêx Adî  
Ew ji mal û milkê dinê çêtir  
in, jaro  
Hay hay hay hay, de bila hey-  
ranê min Sax bit

Wey belê min go dosteka wî  
jî vêra  
Eman, hêhê hêhê hî  
û h.d..  
2- Pesteya Ez xelef im, Beyat  
Kurdî  
Ez xelef im, xelef im Yezdan  
Şêr mîrê Botan e  
Ez xelef im, xelef im Yezdan  
Şêr mîrê mîran e  
Xweyê Xencersedef im  
ûhd..  
Pahîzok hemî bi dengêkî coş,  
pir bi hêz, ne zelal û piçekî  
Pan tene stirandin..  
Peyva Pahîzokê ya kurr û ke-  
çan e. Li pahîzê, kurr û keç li mi-  
qamê bersiva hev didin û li pîstê  
govendê digrin û li hev  
vedgêrin..  
Naverokên Pahîzokan  
A  
1- Hevîna mezin û keçrevan-  
din  
2- Hevîna erdî  
3- Vegeryana koçeran ji zozan  
li pahîzê  
4- Karê pahîzê  
û h.w.d. û di gel vê jî  
B  
5- Ceng û mîranî  
6- Rexne  
7- Pesna siruştê  
8- Bihar û Nevroz  
ûhd..  
Naveroka (A) bûye pênasa  
pahîzokê, wesana di gel morga  
(stîla) lédana muzîkê  
Pahîzok li Botan tete stirandin  
û ji bo çêjê (tamê) piçekî ji sî-  
norên wê derbaz bûye. Bi nav  
wê derbaz bûye. Bi navdeng ki-  
rin pahîzokbêjên Botan jî ev in:  
Emerê Xazî, ji çerxa (sedsala)  
borî,  
Ebdil Ezîz Mihê  
Fadil  
Esker  
Giro (Mihemed Botanî) û h.d.  
Îro pahîzok li bajarên kêma  
maye û morga (stîla) A her kêma  
tete bihistin û belku bi yekcarî ne  
maye..  
Cara bêt 2- Lawik heya hev-  
binê.

## Rojnameyeke nuh "ronahî"

Welat (Bon)- Li Gurcistanê, bi  
taybetî li paytexta wê (Tiblîsê)  
gelek Kurd dijîn. Li wir Kome-  
leya Ronahî, ku seroketîya wê  
Yura Nabiyêv dike heye, her  
wiha komeke şano (tiyatroya)  
profesyonel jî xebata xwe bi  
periyodîkî bi rê ve dibe.  
Bi alîkariya YRWK, Ko-  
meleya Ronahî ya Kurdên  
Tiblîsê xwe gihande derxistin-  
a rojnameyekê.  
Di meha Kanûna der-  
basbûyî de (1991) hejmara  
yekemîn ji rojnameyê derçû.  
Navê rojnameyê Ronahî ye.

Rojnameyeke mehane ye, çar  
rûpel in.  
Li gora gotara sernivîsa-  
riyê, wê naveroka rojnameyê  
giraniyê bide, wêje, dîrok,  
nûçe, çalakiyên komeleya Ro-  
nahî û hwd.  
Em temenekî dirêj ji Rona-  
hî re dixwazin. Hêvîdar in ku  
bikaribe rola xwe ya ku di vê  
demê de gelekî girîng e, bi  
cih bîne û bikaribe dengê me  
bigihîne hemû gelê ku li wê  
deverê dijîn.  
Rojname bi zimanê Rûsî  
derdikeve... Pîroz be!

# Gotinên pêşiyên

## Huseyin Deniz

Gotinên pêşiyên, pirsên  
pêşiyên, peyvên pêşiyên, go-  
tinên bav û kalan, navên wan li  
ser wan in. Gotinên ku bav û  
kalên me ji hezar salan û vir de  
gotine û ji me re bune pend (şî-  
ret) rêber in. Tu gel, tu netewe  
tunene ku di zimanên wan de  
gotinên pêşiya tunebin. Bi rastî  
jî dewlemendiya zimanan, li go-  
ra min bi pîrbûna gotinên pêşiya  
êskere dibe. Ziman dewlemend  
be, di wî zimanî de gotinên  
pêşiyên pir in.

Di vî nivîsana xwe de ez dix-  
wazim li ser gotinên pêşiyên  
Kurdan çend tiştina bêjim.  
Gotnên pêşiyên me hema hema  
li ser gelek tiştan hatine gotin.  
Gotnên pêşiyên Kurdan li ser  
xwezayê (tebîetê) tevgera xwe-  
zayê, rewşên civatî, têkilyên mi-  
rovan û lawiran (heywanan),  
mêrxasî, qelsî, xizantî, şapatên  
salê, pendan û gelek rewşên mi-  
rovanî, cihanî hatine gotin.

Li ser tevgerê xwezayê bav û  
kalê me wiha gotine:

"Ava cemidî ji kaniya qut  
nabe."

"Ava da serî; çi buhustek çi  
çar tîlî."

"Av di cihên teng da deng  
dide."

"Av di golê da bimîne wê  
genî bibe."

"Ba bê şebeşa bidêr ba  
neyê guh bider."

Gelê Kurd gelek rûmet, qedir  
daye jinan, pîrekan. Ji ber vê  
yekê jî pêşiyên me gotine, "Şêr  
şêr e; çî jin e çî mîr e."

Di gotinek din de jî hatiye  
gotin, "Jin û mîr tevr û bîr."

Ku mezin bîxêr be halê gel  
ne tu hale. Li ser vê rewşê vanin  
du gotinên pêşiyên

"Axê me Om'e, xwelî li serê  
me kom e."

"Ku malxwê me silo be wê  
xwarina me çilo be."

Ji bo ku di dawya tiştêkî de  
xirecir dernekeve, pevçûn nebe  
pêşyê me wisa pend li me kirî-  
ne: "Bila şerê şuvê be ne qop-  
qopa benderê be."

Mirovê bixwe ne xebite, ne  
betîle tîrxwarina wî tune ye.

Bav û kalên  
me gotine,  
"Çavê li deri-  
yan xwelî li-  
seriyên." Ya-  
nî bila çavê  
we ne li deri-  
yan be, çavê  
we li keda we,  
li xebata destê  
we be. Peyva,  
"Destê xebitî  
li ser zikê  
têre." û pey-  
va, "Heta na-  
va dest reş  
nebe, tama  
dev xweş na-  
be." jî disa li  
ser rûmeta xe-  
batê hatine  
gotin. Di vir  
de divê mirov

ji xebatê netirse, lewra pêşyên  
me gotine, "Şuxul şêre ku te-  
dest avetiyê dibe rovi."

Çend gotin jî li ser bext:

"Bext keleha mîran e."  
"Bext nadim bi text."  
"Bextê roma tuneye."

Li ser kesê dir û çivok û dere-  
wîn jî bav û kalan ev peyva  
xweş gotine: "Bi gur re dixwe  
bi xwedî re şinê dikşine."

Pêşiyên Kurdan li ser hal û  
tevgera mîletên cîranê xwe ji  
peyvîne. Mesele jîbo Ereb an  
wisa gotine:

"Ereb û rez, Fileh û pez?"

"Ji Ereb re nebên merhe-  
ba wê bîn ser kurk û eba."

"Kêf li Erebînan nayê."

Çend gotinên pêşiyên jî li ser  
Kurmanca ji bo xwe wilo gotine:

"Kurmanc ku tîr dixun ya  
jinkê direvînin ya mîrkî diku-  
jin."

"Kurmanc ter dixwe li  
pêlawa xwe dinêre."

"Kurmanc tîre xew jêr e  
xêr e."

Xayitî dijminetî û neyartîya  
gel mala gel xera dike û tiştêkî  
pir çewt e. Pêşiyên me ji ber vê  
yekê jî yekîfî salox dane û goti-  
ne, "Kurmê darê ne ji darê be  
dar narize." Welatparêzên me

ji ber vê yekê berê kurmê di nav  
me de paqij dikin ku dara we-  
latê me paşê nerize. Lewra,  
"Kuçkê me ye li ber deryê  
xelkê direye." Gerek ne wisa  
be.

Çend gotin jî li ser rewşa la-  
wiran:

"Kûçik goştê kûçik naxwe."  
"Kûçkê pis gur tîne pez."

"Kwêsi hêkê xwe dixê bin  
axê û dibê: Ku ji xwedê re la-  
zim be wê çêlikan derxe."

"Mar ji pûngê hez nake,  
pûng jî li ser qula mîr şin tî."

"Rovyê gerok ji şêrê raketî  
çêtir e."

"Mêşa gû li gû datîne."

"Mirişk niklê xwe di avê  
dakike berê xwe ber bi xwedê  
vedike."

Ji alî bîeyî de jî gotinên  
pêşiyên Kurdan hemdengînin,  
ahengînin. Wek helbestan. Ji  
ber vê yekê jî bi hêsanî di bîra  
mîrov de dimînin, nayên ji bîr  
kirin. Wek:

"Silav li  
mîhê ye ne li  
rihê ye."

"Sih dibe  
bost dijmin na-  
be dost."

"Sare ser-  
maye potik bav  
û bira ye."

"Mala  
mîran kanya  
zê-ran."

"Kurmê şîrî  
heta pîrî."

"Aqil taca  
zêrine di serê  
hemû kesî de  
nîne."

"Ji şer re xal  
û xwarzî ji  
şorbê re ap û  
birazî."



# DERÎ

Faqe Huseyn



## Kurd û zmanê Kurdî (2)

Piştî ez çûm bajarên û min karbidest (memur) ên dewletê nasîn, rasti dabaşek grîngê bi sosret (ecêb) hatim; Ji alî karbidestan ve: "Kurd tune, kert kûrt hen e. Bi hêmana (eslê) xwe Kurd jî Tirkî û ji Asya navîn bi hevra hatine. Di rêda zmanê Tirkî jî bîr krine. Ji bo ku li çiyên û li ciyên berfîn rûniştine, gava li ser berfêra çûne, ji berfêrê pêjna "kert kûrt" hatiye û daketine. Ji ber vê yekê jî wanra "Kertkûrt" hatiye gotin û zmanê wan jî zmanê Kertkûrtaye" dihate gotin. Dema ev gotinên çewtên nadirist, min bhişt gelek şaş bûm û min jî xwera, "Ewên van gotinan dibêjin gelo (eçeba) mrovîn, yan kincên mrovân wergirtî heyînen dînin" digot û dihizirîma (diponijîma).

Di van hizirînan dabûm, pirtûka M. Ş. Firat (Doğu İleri ve Varto Tarîhî) bi dest min ket û gelek şaş bûm. Min xwest ku di demijmêrek (sehetek) da bixwînim û biqedînim. Gava min xwend, min dît ku di derbarê netewe û gelê Kurdîda ji karbidestên dewletê cudatir û çêtir tu dîtinên din nayîne. Heyfa min li wî navî hat. Lewra ew pirtûk, ne dîroka bajarên rojhilata û ne dîroka Vartoyêye. Heker nav danîn peywistbe, jêra "dîroka vran" bête gotin driste. Dûra gelek pirtûkên wsan bi dest min ketin û hemî jî bi gumanên mezin min xwendin. Lê gîşk jî li ser inkar krîna netewe û gelê Kurd hatibûn nîsandin. Piştî xwendîna wan, heyfa min li keda xwendin û bi wanra dem dervaz krîna min dihat û hêrs dibûm.

Min ev dabaş hilda destê xwe û li nav mamostên dbistanan geram. Min dît ku ew jî mîna wan nîsarkan bextreş dibêjin û wlo jî sey (ders) ê zarokên me didin. Gava min ev dît, hizirîm û pêra jî tîrsa min gelek zêdetir bû. Lewra zarokên me di dîroka çewt û dîroka inkariya netewe û gelê xweda dihatin ghandin. Gelo dawîya van zarokan wê bibe çî? û ji van wê çî derkevin? min jî xwe dipirsiya û ez diqehîrim.

Piştî van, ez ketim nav burjuwayên Tirk. Min dît ku ew jî mîna karbidest, nîsarkan û mamostan dibêjin û li serda jî "Em hemî Tirkî, msilmanî û brayên hevîn" digotin û bi tu ewayî dora peyivîne ne didane min.

Dûra ez ketim nav Kurdên burjuwa, min dît ku ew jî mîna wan û hê jî wan jî sosretir dibêjin. Bîr hatinek xwe nebêjim nikarim biborim; Rojê jî rojên havînêbû digel çend heval û çendek jî Bitfisiyên burjuwa li baxçê Çaxlayanê rûniştibûn. Dabaşa Kurd û Tirkîyan vebû û hevalan, Serkanî û hêmana Kurdan, bi ewayek zanîstî hildane destên xwe û vekolan. Di navekra burjuwayekî kete nêv peyivîne û: "Wella hî biz eslîmîzî înkâr edemenox, biz Türkox" got û burjuwayên din jî ewayî bi pejirandinê serên xwe dihejandin. Yekê din jî: "Esîl Türk bîzox, Anadolodekîler sonra Türk olmuşlar" got û dîsa hevalên wî serê xwe dihejandin û: "durgodur, durgodur" digotin.

Di navekra min peywendî bi hnek profesoranra danî, min dît ku ew jî eynî gotinan dibêjin û serda jî "ev ditinek zanîstîye" digotin.

Van bûyeran hê min tevîhev kir. Seydayê min yê mezin (Hacî Mele Osman) wefat krîbû û kesek din jî tunebû ku vê daneka dijar jê bipirsim.

Li ser vê yekê, pêşî min li malbata Tirk û Kurdan mêzan û min dît ku Tirk jî malbata "Oral-Altay" in. Kurd jî malbata "Hind-Avropa" ne. Yanî her yek jî malbatek cudanin û zmanê Kurdî, zmanê tewange. Zmanê Tirkî zmanê bi qertafe. Yanî her yek jî drûvek cudanin. Çawan û bi çî ewayî ev her du malbat û drûvên ne ji hev dibin yek û dibin yek nîjad. Gava min qenc bala xwe dayê ku ev pzo (ancak) di kemalî û güneş dîl teorîsîyêda çare dibe. Piştî vê zanîne, êdî vekolan nedixwest û min dev jê berda.

# Cihê zimanê Kurdî di nav malbata Hîndo-Ewrûpî de

● **Di dawîya 1880-1890'î de zimanzan têgihîştin ku têkiliyeke xurt û tund di navbera zimanên Ewrûpî û zimanên Asyayî de heye. Ev têkilî bi giranî di warê navên lawiran (heywanan) de bi taybetî jî yên kedî, gotinên çalakiyên rojenîn**

● **Lê ji ber ku gelê Kurd ji aliyê erdnîgarî (cografî) ve hevsiyê (cîranê) Farisan in, zimanê Kurdî jî bêhtirî her zimanên din hikariya xwe li yê Farisî kiriye û ketiye bin hikarî û bandoriya (tesîra) wê**

### Dilbixwîn

Wekî ku dihê (tê) zanîn, di sedsala (yüzyıl) XIII û XIV'an de çalakî û tevgereke xurt ji hêla gelek zimannas û lêkolînavan ve li ser "Philology" yê hate çêkirin. Ji bo nimûne (örnek), di sala 1816'an de zimanzan Franc Pop bi dorfirehî zimanê Indo-Ewrûpî şîrove kir, bi şeweyekî zanistî ew nixand.

Di dawîya 1880-1890'î de zimanzan têgihîştin ku têkiliyeke xurt û tund di navbera zimanên Ewrûpî û zimanên Asyayî de heye. Ev têkilî bi giranî di warê navên lawiran (heywanan) de bi taybetî jî yên kedî, gotinên çalakiyên rojenîn, navên tiştan... û hwd. Li gora nerîna wan zimanzanan, têkiliyeke wiha xurt ji aliyê rêzimanî û hûnandina hevokan ve jî heye. Li ser bîngeha vê têkiliyê, wan kesan navekî din li van herdu zimanên zindî (Ewrûpî-Asyewî) kirin. Di dawîya sedsala XIV'an de, navê vê malbatê bû "Malbata Indo-Ewrûpî" (Indo European). Ev malbat bi xwe jî bi gelek şaxan beş dibe, wek:

Civanoka Îndo-Îranî (Indo-İranî (Indo-İraniyan), ku berê navê wê Arî yanî Indo-Arî (Indo-Aryan) bû. Kesên ku bi zimanê vê civanokê jî diaxifî, li Îran, Hind û hinde deverên Rojhilata Navîn niştecih bûbûn, ev jî ber koçkirina berî 3000 sal çêbûbû.

Ev grûp bi xwe jî du (2) grûp in: 1- Endîkî (İndic). 2- Hindî, İranî. Ev (ya Hindî yê kevintirîn ku gelekî zindî ye, zimanê Sensikrîfî ye. Dîroka vî zimanî xwe dirêjî 1000 salî berî zayîna İsa (BZ) dike. Pirtûka olî (Rigveda, Vedas) pê hatiye nivîsandin.

Niha li Hindê gelek ziman hene ku binyata wan Hindî, Ordoyî, Bengalî Koçerati û Romanî ne.

Civanoka duyemîn jî, İranî ye. Ev civanok bi du zaravan jî hev beş dibe: Zarava Rojhilatê (her wiha bi zarava Avista yan Zend-Avista jî tê nas kirin). Zarava din jî, zarava Rojavayê ye (her wiha bi Farisiya kevin an jî Exmîni tê nas kirin). Li gora gelek çavkaniyan, destnîvîsên ku bi van her du zaravan hatine nivîsandin xwe dirêjî sedsalan berî zayîne dikin. Bi taybetî jî pirtûka Zerdest ku di

sedsala VII'an de (BZ) hatiye nivîsandin. Belê, Avistaya Zerdest di wê sedsalê de der çûye. Mîna ku tê zanîn jî, Avesta pirtûka Zerdest a olî ye. Zerdest nerînen xwe di wê pirtûkê de pêşkêşî gelê xwe kiriye. Zerdest ew di şeweyê helbestan de nivîsandibû. Zimanê pirtûkê jî, gelekî nêzikî zimanê pirtûka olî, ya Hindiyan (Rigveda) e.

Her wiha di navbera 300 (BZ) û 900 (BZ) hinde zimanên din ku piraniya wan zaravên zimanên Îndo-Îranî bûn, hatine afirandin, wek: Zimanê Pehlewî (zimanê ferî yê Împratoriya Farisî ya we demê bû). Û zimanê Sogdîyanî, ku li perçeyê rojhilat li Îranê bi kar dihat û zimanê Soka, ku li bakurê Îranê bi kar dihat.

Zimanê İranî ku heya niha di karvaniyê de bi kar tên ev in: Farisî (li Îranê), Biloşî (li Pakistanê), Piştoyî (li Efganistanê), Kurdî û Ustî (li Qafqasê).

Ev nivîsa ku me li jorê pêşkêş kirî, diyar dike ku têkiliya zimanê Kurdî heya kîjan radeyê bi zimanên Ewrûpî re xurt e. Ji ber vê yekê mirov gelek caran rastê ve dibe, çî jî hêla (aliyê) dengdayîne ve dibe, çî jî hêla rêzimanî ve dibe û çî jî jî hêla bêje û wişeyan ve dibe.

Lê ji ber ku gelê Kurd ji aliyê erdnîgarî (cografî) ve hevsiyê (cîranê) Farisan in, zimanê Kurdî jî bêhtirî her zimanên din hikariya xwe li yê Farisî kiriye û ketiye bin hikarî û bandoriya (tesîra) wê. Ji lew re em dibînin ku wişeyên (peyvên) van her du zimanan gelekî li hev nêzik in, heya piranî caran mirov nikare ji hev cuda bike. Bi vê zanyariya xurt ku rojhilatnas, lêkolînavan û zimanzanên payebilind binyata zimanê Kurdî kolandinê, mirov dikare bibêje ku, dayîka zimanê Kurdî ne Exmîni û ne jî Pehlewî ye. Taybetiyên zimanê Kurdî serbixwe ne, hemû lêkolînavan ev rastîyan îspat kirine. Ev ziman; li gora çavkaniyên zanistî (ilmî) bîngeha xwe ji Avistaya Zerdest digire. Her wiha jî hêla hûnandina hevokan û lêvkirina gotinan gelekî serbixwe û xwedî dengên taybetî ne, ku gelê Kurd di dîrokê de li gora êş, nalîn, kêfxweşî û dilgeşiya xwe afirandine. Tu caran ev rastî nayên veşartin.

Bê guman, pîrsa zimanê neteweyekî wiha bi gotareke kurt nayê şîrovekirin. Em hêvî dikin ku di pêşerojê nêzik de vê pîrsê bi şeweyekî dorfireh rave bikin.

## Zimanê dewletê û "Zimanê Çiya"



Harold Pinter, di sala 1989'an de bi nivîskarê Emerîqanî Arthur Miller re hate Tirkîyê û li welêt tev de geriya. Piştî vegeerî Ingilîstanê "Zimanê Çiya" nivîsî.

"Zimanê Çiya" rewşa 20 milyon gelê Kurd tîne ziman. "Zimanê Çiya" trajediya miravetiye ye. Ev 70 sale zimanê Kurdî qedexa kirine. Gelê Kurd nikarîbu bi zimanê xwe bipeyive. Pinter vê hovîtiyê li cih dibîne û vê tiyatroya giranbûha dinivîse. Tiyatro bi Kurdî di nav wêşanên Dozê de bi wergerandina Mehmet Uzun derket.

"(Zabit ber bi jinan diçe)  
"...Hûn xelkê çiyayî ne. Hun têgihîştin? Zimanê we qedexa ye. Zimanê we mirî ye. Ew ne serbest e, kes nikare pê bipeyive. Êdî zimanê we tune ye." (Rupel 19)


Harold Pinter sedema nivîsandina vê leyiskê

wiha dibêje: "Çawan ez dê li hember vê hovîti û anti-demokratîzmê bêdeng bimama? Na, ne mimkûn bû. ...Ez xwe azad û serbest nahesibînim. Ji ber ku gelekî jî 20 milyona zêdetir, yanê gelê Kurd li ser axa xwe, li welatê xwe nikare bi zimanê xwe bipeyive. Zimanê wî qedexa bûye. Mixabin ku dinya bûye cehennem... kirine cehennem. ...Cehennem û zebanî li wir, li Kurdistanê, li ber çavan in. Pir vekirî, aşkera û tazî... Min xwest, ez jî bi awayê xwe, vê yekê salix bidim..." (Rupel 11)

Harold Pinter, wazîfêke mirovî, internasyonalî tîne cih.

Pirtûkeke wiha li ser rewşa (halê) gelê Kurd, zulm û zordariyê û girtîgehê (hepîsxanê), li vî erdî nehatiye nivîsandin. Harold Pinter, bila ji rewşenbîr (zana) û nivîskarên Tirk re bibe mîsal.

# Gelê Kurd li hozanê xwe xwedî derdikeve



● **Quba Ehmedê Xanî hat avakirin. Quba zana û ozanê mezin Ehmedê Xanî ku berî bi salekê destpê hatibû kirin, mehên li pêşiya me dê biqede û ji bo xelkê bête vekirin.**

Hezîrana sala çuyî Belediya Doğu Beyazit ji bo zana û alimê Kurd Ehmedê Xanî qubek avakir. Qub çend mehên din dê vebe. Bepirsiyarên belediyê dan zanîn ku avakirina qubê qediyaye û raxistina hundir ji li ber temamkirinê ye.

Bi alikariya serokê belediya bajêr Mahmûd Kotan ev nêzikî salekê ye ku karê avakirinê berdewame. Ji bo qubê kevirên mermer ji Xelatê (Ahlâtê) û kevirên şehkîrî hatine bilkarandin. Di derheqa quba Xanî de serokê belediyê ev got:

Projeya qubê me amade (hazir) kir. Me giş mesref û çuyîn girte ser xwe. Xanî yê me gişan e, em li bendeyî alikariya her kesî ne." Her wiha Mehmed Kotan got ku, ev qub li ser tîrba Xanî hatiye avakirin.

Ehmedê Xanî peyvên mîna "neteweyî" (milet) û "dewlet" ku ji bo Kurdan ne pir nas bûn, hê di sedsala 17'an de di berhemên (eserên) xwe de xebitandine, zimanê Kurdî berz û bilind kiriye û bala gelek zanayên cîhanê (dinyayê) kişandiye ser xwe û hilfa gelê Kurd wergirtiye.

Li bajarê Beyazidê hezjêkiri-na xelkê ji bo Xanî xwiya û heşkere tê dîtin û xelk bi serê Xanî sond dixwe. Bandêra (tesîr) Xanî li ser xelkê Beyazidê li her derê mirov dibîne û his dike. Her sal bi hezaran kes ten ser tîrba Xanî û ziyaret dikin. Tê gotin ku Ehmedê Xanî li gundê Xanê (berê girêdayê Hekariyê û niha girêdayê Wanê ye) hatiye dinyayê. Hin kes dibêjin navê Xanî jî ji vir tê. Hin jî dibêjin na, navê diya wî Xanê bû û wî paşnavê Xanî jî navê diya xwe girtiye.

Berhemên (eserên) Ehmedê Xanî hene. Mem û Zîn ji gişan nastir e. Jê û pêde Ehmedê Xanî ji bo zarokan jî pirtûkek (kitê-bek) navê bi Nubara Biçûkan û ji bo mezinan jî Qaîda Îmanê nivîsîne.

Nûçe (Xeber): ZPS



## "MEM Û ZÎN" BÎ KURDÎ

Filmê Mem û Zîn di meha Adarê de li sî-nemayan wê bi dublaja Kurdî bê nişandana. Ev filmê ku ji hêla filmkêşên Tirk hatiye çêkirin û babeta xwe jî Mem û Zîn, çiroka Kurd ya bi nav û deng sitandiyê û ji meha zivistanê navîn ve ji hêla bi hezaran temaşevan ve hatiye temaşeyê kirin. Filmê Mem û Zîn, nemaze, li bajarên Kurdan bi dilbestiyeke pir mezin û tund tê temaşeyê kirin, ji ber ku naveroka wê beşek ji çiroka Kurdan pêşkeş dike û wek çirok di şevbihurîkên Kurdan de ji sedan salan ve hatiye gotin. Mem û Zîn ji hêla hozanvanê Kurd yê bi nav û deng Ehmedê Xanî hatiye nivîsandin û di nav berhemên klasîk yê dinyayê de bi xwerûyîya xwe cihêkî gelek girîng standiyê. Film pêşî li Diyarbekir, peyde jî li Sêrtê wê bileyize.

## AZADÎ

Abdurahman Durre



### Aşî hat

Aşî navê herikandina berfê ye; Berf ku li beralên çiya û keviyên newalan (basû digre) li ser hev kom dibe diherike tê xwarê, jê re dibêin: Aşî hat. Aşî dema ku tê perende jî (teyr jî) ji ber xelas nabin. Ji ber, tenê qijika belek ku tîk difire, dikare xelas be.

Ji ber vî qasî aşî felaketek xwezayî ye (tabîî). Bi ser mirov de tê. Belê di nav xelkê de ev bawerî heye ku aşî, bi ser neheqan de tê, ku jê re dibêjin aşîta xwedê bi ser de hatiye.

Gelek gotinên pêşyan jî li ser aşîte hene. Gelek nîrîn jî bi aşîte tên kirin. Wekî: Aşî aşîta xwedê ye. Aşî felaketek giran e, xwedê bi serê kesî de neyne. Aşîta çiyayê mezin jî mezin e. Weyla aşî bi ser de hatî. Ev çî aşî bi ser me de hat. Aşîta girano, aşî bi ser de hato.

Ez dibêjim ku eger aşî bi ser neheqan de bihata neheqî li dinyayê ne dima û... Belê neheqî heta neheqiyê ferq heye. Gotinek pêşyên Tirkî heye, dibêjin "Zalimin zulmu varsa mazlumun da ahi vardır." Ev gotin tiştêkî di bîra min tîne; em zarok bûn, diçûne hêla kewa. Dê û bavê me ji me re digotin: dema ku hun dikevin newal û geliyên kûr, bi dengê bilind ne qîrin, wê aşî bi ser we de bê. Dixwiye ku axê mezlûman jî wilo ye.

Li serheda me, ji mirovên netebitî û mûzir re jî dibêjin Aşî. Di ola Zerdestî pêxemberê Kurdî de, ev bawerî heye ku, neheqî û nexweşî, nerindî û tarîfî, bi destê Ehreman e; heqî û qencî, aşî-tî, hêsayî û ronahî jî bi destê Yezdan e (Hurmuz). Çawan ku ola Îslamê jî ji ola Zerdestî ew doz girtiye, gotiye, Şeytan û Melek.

Zerdestî pêxember dibêje: Di dawî de heq zora neheqiyê dibe, tarîfiya zilm û zorê diçe, ronahiya aşî û xweşîtiyê dertê.

Hêvîdarin ku bighîjin wê ronahiyê, ji aşîta zilm û zorê xelas bin, bi xweşî û biratî û wekhev bijîn.

**Aşî herikî nizanîm çima / Esker xerîqî di bin da ku ma**

Mixtar zana bû, yan zana jêr got / Sibe zû rabû, wekî dîkê pot

**Bang a sibê da, gote gundiya / Derkevin jê da, gelî cindiya**

Aşîta xweda, xweda ê mezin / Neyê ser we da, nemînin li bin

**Gundî derketin, bi jin û bi zar / Leşker veketin, aşî hate xwar**

Kurd û Kurdistan, barişt û bager / Keçê şoreşvan, xortê şoreşger

**Berf û bagerê, Hekar û Şirnex**

**Tîm û leşkerê cendek bûne kerx**

Aşîta xwedê, bi ser wan de hat / Qada serhedê qada rojhilat

**Bê deng û xeber, bê saz û bando**

**Ketne ceng û şer, tîm û qomando**

Barişt û dûman, evravî û mij / Berf û zivistan, aşîta mêrkuj

**Derdê bê derman, aşîta welat**

**Baba Suleyman Ji Davosê hat**

Erdal û Gureş, çune hewarê / Hewa nebû xweş, ne dîtin çarê

**Nota Eskerî şandin li Yezdan / Tat û Ezerî, Özbek û Turan**

Gotin ku çare vê der buharê / Ji bin ve rakin, em koka darê

**Xeber dan Neco, şandin ba xwedê**

**Turkeş go Eco, tawîzê nedê**

Emê bibin yek, xwîna şehîdan

Bê şubhe û şik, hildin ji Yezdan

**Aşî û bager, bune Apocî / Ketne ceng û şer ew jî li her cî**

Yezdan go Neco, bune pêkenî / Siktir be Eco xocê dîn genî

**Tiştê ne başî, ne karê me ye / Karê me başî, aşîti heye**

Heqe, navê min, ez heqî dikim / Xweda ê mezin, neheqî nakim

**Herin ba Şeytan, bêjin Ehreman**

"Ne yaptın ulan, ne ettin ki sen?"

Çûne ba Şeytan, li ber dan çokan / Şeytan gote wan, her du serokan

**Tiştêk di dest min, tune ez benî / Eji ketim bin, rûreş û tenî**

Bi ser min de jî, aşîta wî hat / Hê ku di bin de jî hê û hêjî mat

**Neco spas kir, Eco qemiti / Ji cî firqas kir, serdev şemiti**

Çiroka welat, barişt û bager / Aşî ku lê hat, gundî û leşker

**Zarwên feqira li ber mirinê / Şah û wezîra, li kêf kirinê**

Ji bo çî dimrin, ew jî nizanin / Daykê wan digrin ax û fixanin

**Ku ji bo welat be, welat ême ye / Cerd û celad be, Xwedê jî**

heye

Bela neheqa, Hurmuz û Yezdan / Bide neheqa, ji ber nigê wan

**Here zivistan, buhar û newroz / Were gulistan, cejna we pîroz.**

# Zarok fêkiyên mala ne

Civata Kurdî ji awirekê de civata xort û zarokan e. Zarokên me zehf in, em welatekî têzarok in. Em ji aliyê zarokan de têr û dewlemed in. Dayik û jinên me ava ne, terr in û her yekê hejmarek keç û kurr tîne, keç û kurrên me bi dê û bav bin.

Kurd pir hatine kuştin, îro jî tene kuştin. Gelê me vebirrîn û qirkirinên mîna Geliyê Zîlan, Helebçe û Besta Qesaban dîtine. Ditirse ku biqele û rojekê wînda bibe.

Di vê derbarê de Musa Anter serpehatiyeke xwe vîha dibêje. "Sala 1990 î li Edenê Mafên Mirovan (Însan Hakları) ez dawet kirim, min konferansê da. Pir însan hatibûn. Konferansa min xelasbû, dora pirsan hat. Pîrekek xemilandî û hezjixwekirî rabû û go efendim, tu di heqê Kurdan de şitexilî lê te qala heqê pîrekên Kurdan nekir. Min go lawo, ku ez dibêm Kurd pîrek û zilam bi hev re ne, ma tu dibê çî? Go efendim hun keçikên xwe zû dizewicînin, zarokan pir çêdikin ma ev ne çewtê heqê însanan in? Min go yanî tu dibê bila pîrekên Kurdan gelek zarokan neyînin, go.

- E. Min go:

- Lawo ne wilo nabe, jinik Tirk bû. Hun ji alîkî de me dikujin û ku em jî gelek zarokan neyînin emê biqelîn qîza min.

Jinik fedîkar bû û guhdaran jî ji min re got bijî apo û li çepkan xistin."

Zarok xortên sibehê û dê û bavên dusibehê ne. Di nav têkoşîn û berxwedana me de zarok jî hene. Zarokên me ne bi tenê fêkiyên mala ne, belê bune berxwedanvanên me jî.

Em divê zarokên xwe mîna çavên xwe biparêzin, wan bi hest û hişekî welatparêzî mezin û xwedî bikin.

Heta niha zarokên me fêkiyên malan bûn, belê ev çend sal in, bûne berxwedanvan û alîkarên welat jî.

Ji vê hejmarê û pêde em dê di Rojnameya Welat de ji bo zarokan jî beş û şaxekî vekin. Zarokên me ev heq kirine û hêjane ku em serê xwe bi van re bêşînin û bi qeys mezinan û zêdetir jî wext û hişê xwe bidin wan.

Em hêvîdar in ku giş xwendevan û dayik û bavên me li her aliyê welatê me zarokên me bi tenê nehêlin û ji bo rûpelê zarokan ji me re binivîsin.

*Bû êvar saet bû neh zarokên me razan  
Roja din heft û niv roj hate danpezan  
Zarokên me şiyarbûn, rabûne ji nava cihan  
Zarokno roja we bi xêr  
Çavreşno roja we bi xêr*

*Yeko yeko dan pey hev li medbexê civiyan  
Rûniştin li dor masê hawîrdor mîna guran  
Birçîne dixwazin xwarinê bûye ferman  
Zarokno roja we bi xêr  
Çavreşno roja bi xêr*

*Hinik ji wan dibên hêk, yên mayî dibên tehîn  
Bêhna wan pir teng e, dibên zû xwarinê werîn  
Bûye şer li ser xwarinê qelebalix û şingîn  
Zarokno roja we bi xêr  
Çavreşno roja we bi xêr.*

*Me xwarin xwar bi selamê tu tifaq ne qewimîn  
Ji kêfa û ji çepka destên me tev werimîn  
Me rojek din derbaskir bê teşqe û nexweşî.  
Zarokno roja we bi xêr  
Mindalno roja we bi xêr.*

*Bav rabû bi lez li saeta xwe nerî  
Xwe çemkir şekala xwe li ber derî  
Bi lez û bez di devê derî re pengizî  
Zarokno roja we bi xêr  
Şêrinno roja we bi xêr.*

**Tolehildana Mûriyan** kitebeke zarok û xortan e. Mezin jî vê kitêbê di karin bix-



wînin.

Eslê kitêbê bi Farisî ye û nivîskarê wê **Îbrahîm Derexsanî** ye. Wêneyên kitêbê ji aliyê **Fernando Donaïre** hatine çêkirin û wergêr **Bavê Berzan** e.

Weşanxaneya Rewşenê kitêb çap kiriye.

Em dê di du hejmarên **Welat** de vê kitêbê ji bo zarokên xwe "fêkiyên mala" û serhildanan biweşînin.

Zimanê kitêbê ji bo zarokan giran jî be em hêvîdar in zarok û xortên me hez jê bikin.

Mûrî li erdê digerin. Lewma ji wan re, gêrik jî dibêjin. Mûrî candarên gelekî jêhatî ne. Bihar û havînan, bê rawestan li dû xwarina xwe ya zivistanê digerin. Dema tişteki xwarinê bibînin, digirin û



dikişînin hundirê xaniyên xwe yên binerdî. Xaniyên wan ji qulikên dirêj û badayî çêbûne. Ji xaniyên wan re, kun, kuna mûristan dibêjin. Mûrî xwarinên xwe, bihar û havînan dihênin û dicivînin ser hev. Dema zivistanê berf û baran were, wê gavê xwarinên xwe yên ku bihar û havînan civandine ser hev, derdihênin û dixwin.

Mûrî hemû bi hev re dixebitin. Mîna malbateke yekdest, alîkariya hev dikin. Çi kar li ber wan hebe, bi hev re dikin. Lewma karên wan bi zûka û bi hêsaniya kuta dibe. Carna xwarinên ku dihênin malê, deh caran bi giraniya wan e. Eger mirov bi hev re û ji dil kar bike, wê

xwe dikirin. Lê ji nişkê ve, hirçekî pir bi hêrs û dirr, bi gurmîn hat ser kuna mûristanê. Kuna



mûriyan ji erdê rakişand û bi hewa de hilweşand. Mûriyên ku ji kunê derdiketin derve, hirç wan bi herdu kulmên xwe digirt û dixwar. Aveke tirş di laşê mûriyan de hebû, ku hirç pir jê hez dikir.

Gava ku hirç tî û birçî dibû, dihat ser kuna mûristanan ji bo xwarina mûriyan.

Lê vê carê, du kurmûrîkên biçûkî, xwe veşartibûn û bi vî awayî ji nav le-pên hirçî rizgar bûbûn. Dabûn ser riyekî û diçûn. Di rê de ji hev dipirsin û digotin:

- Ka, em dê bi çî awayî ji vî hirçê dirr û har rizgar bibin?

Navê yekê Gago, navê yê dinê jî Soro bû

**Wê dom bike.**



**TOLEHILDANA MÛRIYAN GAGO Û SORO (Çîrok) Îbrahîm Derexsanî**

gavê mirov dikare wekî van kurmûriyên biçûk ên li mûristanan, pir bi hêsaniya karê herî mazin û dijwar, bike.

Dem a hevalek ji wan, bareke giran hilgirtibe ser milên xwe, yên destvala bazdidin û diherin pêşiya wî û alîkariya wî dikin. Wê gavê ew barê giran, di destên wan de gelekî sivik dibe û bi hêsaniya ew dadihênin cih.

Mûrî bi vî awayî bi dilxweşiya hevalbendiyê, bi dilovanî û şahî dijîn.

Rojekê dîsa mûrî li dora kuna mûristanê, bikêf û henek, karê

## Bêdengî kuştinên...

**Destpêk rûpel 1** Şik û gûman tê de nemaye û bahweriya xelkê ew e ku cêbecêkerê van kuştinan tev Kontr-gerîla ye. Kontr-gerîla ewil bi kuştina mirovên rewşenbîr, demokrat û berpirsiyarên rêxistinên girseyî destpêkir û bi van kuştinên dawî diyare niha jî berê xwe daye xebatkar û kedkarên rojnamegeriyê.

Dewlet û hikûmet di derbara van kuştinan û yên heta niha bûne de çu gaveke cidî neavêtiye. Ji bo girtina kesên qatil çu tişt nekiriye û xwe nebihîstî û kerr dike.

Ne bi tenê xwe nebihîstî û kerr dike, belê her wiha ji devê Wezîrê Hundir İsmet Sezgin dide zanîn ku: "Win nikarin ji min re îspat bikin ku ev kuştin ji aliyê Kontr-Gerîla tene kirin."

Berî bi mehekê di civîna Komîteya Ewlekariya Neteweyî (MGK) de Waliyekî ev digot: "Heger rojnamegerî ne zêde, tenê 6 mehan bê deng be, em dê wê pirsê ji binî de bibirrin."

Mirov dikare ji vê peyvê derxe û binase bê ka niwêner û serkarên dewletê bi çî çavî li mirovên rojnamevîsar û rojnamegeriyê dinerin. Daxwaz bêdengkirina rojnamege-

riya objektîf û bi cesaret e. Ji xwe dengê rojnamegeriya Tirkiye ev demeke dirêje demakeve û mîna ku dirêktîfên Walî û Komîteya Ewlekariya Neteweyî herket bikin, bi carekê re bê deng û kerr bûye.

Kuştina Halit Güngen û ya Cengiz Altun du kuştinên plankirî, bi şewir in û qatîlên wan yek in.

Cengiz Altun ev nêzîkî du salane ku bê sekin û bê newêrekî mîna xebatkarekî Rojnameya Yeni Ülke kar dikir û bi mîranî û mîrxasî kirên Kontr-gerîla û Hizbul-Kontra heşkere dikirin. Berî bi demekê li Gercoşê jî hatibû girtin û heger xelkê ew nedîtûbûya wê hê wê care ew kuştûbûna.

Kuştina Cengiz Altun li pir deveran û li hin bajarên Kurdistan hate protestokirin û xwepêşandaneke mezin li bajarê Batmanê hate li darxistin. Di mitîngê de zêdeyî 25.000 hezar mirov beşdarî kir.

Heger rê li xelkên ku ji bo xwepêşandanê ji derve dihatin Batmanê nehatiba girtin şik tê nîne wê hejmara beşdarvanên xwepêşandanê bigra sedhezaran.

Heta berî rojnameya me here çapxanê jî ji aliyê hikûmetê çu tişt nehatibû girtin.

## Ceş çekên...

**Destpêk rûpel 1** ya daneynin, hê biryara xwe ya dawî nedane. Dema ev herdu eşîr di nav erê û nayê de difikirin, li Çolemergê nezîka 120 parêzvanan biryara xwe dan ku çekên di destên xwe de bavêjin. Yên ku biryar girtine çekên xwe deynin dibejin" dewletê em xapandin, em ji rê derxistin û bi me lîst. Em ji gundên me dûrxistin. Em di nav dost û mirovên xwe de kirin çeş û sîxur. Çeşekî kevin ji Kir-daxê dibêje "Bi salan dewletê mejiyên me şuşt. Em divê li hember vê derkevin. Dewletê em kirin dijminê birayên me," Parêzvanekî din dibêje: Muh-

leta efû û lêborîna partiyê di Newrozê de diqede, me bivê nevé em dê çekên xwe deynin."

Xelkê gundê Dêzê (Kirikdax) û gundên cîran ku teqez dê dev ji çeşîtiyê berdin dibêjin: "Me çek ji ber bêcaretiyên maddî pejirandibû, em niha poşman in" dibêjin. "Gerek Jîrkî jî çekê dewletê deynin, berî ku dereng bibe". Ji eşîra Jîrkan yek dibêje: Tahir Axa jî ne wek berê ye, nemaze piştî tiştê hat serê çeşên Îraqê, bahweriya wî bi dewletê nema tê, ditirse ku cynî tişt rojekê bê serê wî jî.

## Civîna nasandina...

**Destpêk rûpel 1** Roja îne (21-2-1992) saet 12'ê nîvro, li Lokala "Komela Rojnamevîsarên Hemdemî" (Çağdaş Gazeteciler Cemiyeti), ji bo nasandin û ji dayîkbûyîna Rojnameya Welat Civînê hate kirin.

Giş rojnamên mezin û rojane yên Tirkiyê vexwendiyê (dawetli) civînê bûn, di civînê de gelek rojnamevîsar, şexsiyetên nas yên Kurd û ne Kurd û mêvanên giranbiha amde bûbûn.

Bername (gundem) û rojeva civîne wiha bû: Berpirsiyarê Giştî Abdullah Keskin yê Rojnameya Welat bi xêrhatina rojnamevîsar û mêvanan kir û pişt re bi zimanê Tirki axaftinek pêşkêş kir. Ev axaftin li mêvanan û beşdarên civînê jî hate belakirin. Axaftina (konuşma) duhemîn nivîskarê Rojnameya Welat berêz (sayin) Musa anter kir. Axaftina sêhemîn ji aliyê parlamenterê partiya SHP ê, Zübeyir aydar hate kirin. Zübeyir Aydar her wiha xwedî Rojnameya Welat e jî.

## Barzanî ji Tirkiye piştgirî û alîkarî...

**Destpêk rûpel 1** -Win dikarin sebebên serdana xwe ya Tirkiyê bidin nasandin?

-Ez ji bo ku hikûmeta nuh nas bikim û pîroz bikim û sipasdariyên xwe pêşkêşî Turgut Özal, Süleyman Demirel, Erdal û Hikmet Çetin bikim ez hatim. Min ew dîtin û bi wan re civîn çêkirin.

-Civîna te bi hikûmetê re çawa derbasbû, daxwazên te ji hikûmetê çibûn?

-Min daxwazên me yên ku ji hikûmeta Îraqê hene ji wan re gotin daxwaza yekê, me xwest em sînore xwe bi hev re biparêzin. Me li ser otonomiyê, otonomiya em dixwazin çiyê, me ew agedar kirin û dawî me dîtin xwe li ser Îraqê demokratîk da zanîn ku gava aşîti û wekhevî hebe li Îraqê em dikarin bi hev re bi-jîn.

-Ji bo hîlbijartina 3 yê meha Nisanê win dibejin çî?

## 'Gelên me biran...

**Destpêk rûpel 1** 425 ji van qanûn û biryaran in. Li aliyê din dewletê her mirovê Kurd mîna neyarên potansiyel raserî çavên xwe kiriye.

Raya demokratîk û şoreşger di dema pêwîst de li hember qanûn û biryarên sansur û sîrgonê demeket. Desthelatdarên jî ji vê cesaret stand, "Qanûna Terora Dewletê" derxist û berê xwe dan xelkê. Êdî roj tine ku bi navê terorîstiyê li malan, li sikakan, li çolê û serê çiyaran mirov neyên kuştin.

Bi vê jî nasekinin. Xelkê li dij gelê Kurd disûn û tofê dijminayetiya nav gelan direşînin.

Em dibêjin: Gelên me, gelên Tirk û Kurd bira ne. Çu sebeb nînin gelên me dijminayetiya hev bikin. Kes nikare me bike dijminê hev. Ji ber van sedeman me xwest em bala raya giştî bikîşînin ser rewşa îro, mirovên neteweyên Tirk û Kurd şiyar bikin û birayetiya gelên Tirk û Kurd berz bikin. Ev xwepêşandan ji bo vê ye û diruşmê "Gelên me biran in, vebirrin bes in" dê 1 ê Adarê bête rakirin û bangkirin.

Welat: Ji bo beşdariya di mitîngê de we kes vexwend, we ban çu hêzan kir?

Kemal Okutan: Helbet, me giş rêxistinên girseyî û demokratîk, hêzên çep yên siyasî û partiyên çep vexwendin.

Li aliyê din Parlamenterên Partiya Keda Gel HEP ji bo rawestandina şer û vemirandina agir ragihandineke amade dikin. Ev ragihandinê de ji bo înzeya parlamenterên din jî bête pêşkêşkirin. Piştê de ji bo serokê dewletê Turgut Özal, Serokwezîr Süleyman Demirel, Cêgirê Serokwezîr Erdal İnönü û serokê Artêşa Tirk Doğan Güreş re bête rêkirin.

Li ser hîlbijartinê min di civînan de dîtin xw şiro vekir, di vî babetî de me ji hikûmeta Tirkiyê piştgirî û alîkarî xwest. Rojnaman li ser min hin tiştên ne rast nivîsîne. Em dixwazin hîlbijartineke demokratîk bikin, valahiya otorîteya siyasî û îdarî dagrin.

-Heger îmkan hebe hûn bi hikûmeta Îraqê re li hev bîn û itifaq bikin, wê itifaqa we bi çî rengî be?

-Heger li hevhatin bibe, pêwîste ji Ereb û Kurdan Meclîsek bê avakirin. Heger lihevhatin dereng bikev e, divê ev valahiya siyasî û îdarî dalqandî nemîne û çare jî ev hîlbijartin e. Hîlbijartin ne cûda bûne ji Îraqê.

-Dewleta Tirkiyê dikeve

Kurdistanê Îraqê û dide dû PKK li ser vê hûn dibejin çî?

-Em naxwazin şerê navhekûmeta Tirkiyê û PKK têkeve erda me. Lewra serêşanên me besî me ne, têra me dikin. Em dixwazin ew jî bi regekî demokratîk pirsên nav xwe çareser bikin.

-Hûn dikarin tixûbê xwe kontîrol bikin?

-Em kontîrola tixûbê û sînornikarin bikin. Ne karê me ye ku em şerê PKK bikin, em tîkildar nabin. Herwiha em naxwazin hikûmeta Tirkiyê jî di axa me de şerê PKK bike. Di êrîşa hikûmeta Tirkiyê de 48 pêşmergek me hatin kuştin û 60 mirovên me jî birîndar bûn.

## Cedewa salan gerîna...

**Destpêk rûpel 1** Konseya Ewlekariya Neteweyî (MGK) "pêşneyara" xwe da rêberiya Wezaretê (Bakanlar Kurulu). Li gora vê pêşneyarê divê Gerîna Awarte (Olağanüstü Hal) çar mehên din bête direjkin. Hikûmet dê vê "pêşneyarê meha li pêşya me angû meha Adarê berpeyî Meclîsê (TBMM) bike.

"Pêşneyar" bûye sebaba diyatî û nerehetiyên mezin di nav parlamenteran û li derveyî parlamenteran de.

Wek tê zanîn gerîna Awarte ji sala 1987 an û vir de heye û li pey hev tim hatiye dirêjkirin.

Di hîlbijartina meha Çiriyê de sala çûyî giş partiyên îro hatine ser kar gava ku li nav xelkê digeriyan û hewcedarên dengên xelkê bûn digotin: Heger hûn dengê xwe bidin me û me hîlbijêrin em dê gerîna awarte rakin.

Nêzîka çar mehan derbas dibe û heta niha jî ji aliyê xwedî van soz û ahdan çu hewleke (çaba) berçav nehatiye kirin.

Gerîna Awarte ji herderê û ji herçihî bêhtir şeniyên (sakinleri) Kurd dêşîne û binçu dike. Ew "Pêşneyar" dê careke din bête direjkin ya na emê meha Adarê bibînin.

## ROJEVA WELÊT

### Destpêk rûpel 1

Qeleşor û wênêkêşên navdar yên mîna Taha Akyol ketin kar û ji bo mezinkirin û populerkirina Berzanî çî ji wan hat kirin.

Bê qam û bê qedar pêsnê Berzanî dan. Jê re bûn şabaşvan û bask pêve kirin û firandin.

Ewqas bê endaze pesnê Berzanî dan û jê re li çepikan xistin ku Berzanî jî hinekî ji vê pesindayîna bê pîvan kete şikê. Bi mebesta sivikkirina vê şikê, kincên Kurdî li xwe kirin û bi şal û şapê kal û bavan bi Demirel re suretê xwe girt.

Ev şik çiqasî sivik kir, çendî bi serket em nizanin, belê wêne û sûretê Berzanî bi Demirel re, Diyab axa û Mustafa Kemal anîn bira me û bivê nevé me ji xwe pirsî, gelo ev ne Diyabaxayetî û Kemaltiyêke nuh e.

Pirsên di serê me de hevdû han dan û pirseke dudwan pekiya pêş: Gelo hevdûdîtin Demirel û Berzanî di pey çî de ye, çî hildigre û berê wê li ku ye? Hevdûdîtin û bihevrebûyîna Mustafa Kemal û mirovên mîna Diyab Axa gelê me xapand û şemitand.

Hevdûdîtin û jihevrexweşkirina Serokwezîr Süleyman Demirel û Berzanî jî dirêjayî û dewama vê malkambaxiya kevn e û wa diyar e dê ji ya berê ne baştir be.

Kurdên îro ne Diyab Axa ne, ne eşîr û bavikên zemanê berê ne. Her wiha her serok jî ne Mesud Berzanî ye. Kurd hişyar in, lingên xwe di xefkan de xwarine û êdî başî û xerabiya xwe dizanin.

Özal hebûna 12 mîlyon Kurd dipejirîne, Demirel jî "realîte" û rastiya Kurd heye dibêje. Desthelatdar û giregirên Tirkiye divê ewil van "12 mîlyonan" û vê "realîte" bibînin, bi niwênerên 12 mîlyona re vê realîte munaqêşe bikin û hê paşre "alîkariya" Kurdên Başûr bikin. Ya rast û dirist ev e.

- Mamostayê Hêja, ji bo lêkolînê we yên li ser gelê Kurd, hun gelek salan di girtigehan de man. Li alîkî dozên we li dadgehên (mahkemên) Tirk berdewam dikin, li alîkî din pêşengên dewleta Tirk, dibejin; "Kemalîzm kevn bûye û nema bersiva demê dide." Îro li her aliyê welêt, demeke nuh xwiya dike. Hun çawa dibînin vê dema nuh?

Kemalîzm îdeolojiya resmî ya dewleta Tirk e. Ev 70 sal in wisa ye, siyaseteke xwedî derbasbûn e, ketiye her derê, ji aliyê giş dezgah û saziyên dewletê tete parastin. Ji bo liserpiyanmayîna Kemalîzmê çî ji destên hêzên deshelatdar tê dikin. Kemalîzm ne miriye, belê derbên xedar xwarine û bi birînên kûr birîndar bûye. Ev birîn nayên rapêçan, derman nabî. Kemalîzm îflas dike.

### GEL PÊŞVE DIÇÊ

- Berê mafê gelê Kurd ye neteweyî inkar dikirin. Inkare fêde nekir, Kemalîst îro dixwazin bi çavêkî din li pirsê Kurdan binêrin. Çi ne sebên vê guhertinê?


Sebaba ewil guhertinên li welêt in. Di van 10-15 salên dawî de welat pir hatiye guhertin. Pêşketin û serketinên çanda konevaniya gelê Kurd, pirsê Kurdan derxiste pêş û cihê gelê Kurd di nav gelên Tirk-Ereb û Faris de li Rojhilata Navîn xiste bin pirsê. Vê yekê îflasa Kemalîzmê bi xwe re anî. Li aliyê din têkoşîn û berxwedana li Bakurê Welêt heye û bi 15'ê Tebaxê destpêkiriye, ev îflas lezandiyê û roleke bingehîn lîstiyê.

- Îro koalîsyona çend partiyên hatiye ser kar. Demîrel serekwezîrê vê koalîsyonê ye. Demîrel ji aliyêkî "Kurd hene" dibêje û ji aliyê din cihên Kurd lê niştecîh in tije leşker kiriyê, çiya û gündên vê deverê bombebaran dike. Kontr-gerîla jî kuştinan dom dike. Hun vê dijayeti û dirûtiyê çawa dikarin bi nav bikin?

Demokrasiya Tirk li vir teqiniye, piştixûzî û riswayiya wê li vir e. Ya ku demokrasiyê bi dev ve biriyê erdê û xetera mezin e ev bi xwe ye. Yên ku li welêt siyasetê datînin û digerin ne partiyên siyasî, ne hikûmet û ne jî meclîs e. Sazûmana Ewlekariya Neteweyî MGK ye. Siyaset ji aliyê Sazûmana Ewlekariya Neteweyî tê dariştin û ji bo cêbecêkirinê pêşkêşî şewra hikûmetê tê kirin. Herçiqasî rê û awayê qanûnî wa bi xwiye jî di esas de ev ne pêşneyar belê ferman e.

Li milê din rastiyeke civakî û neteweyî heye ku xwe ferz kiriyê. Li jêr bandê û berxwedana vê rastiye deshelatdarên hikûmetê "em realîta Kurd" dinasin dibêjin. Belê naverok û hundirandina van peyvên "em realîta Kurd" dinasin dê li gora ferman û mecrên Sazûmana

# 'Kemalîzm îflas dike'



## İSMAIL BEŞİKÇİ

Ewlekariya Neteweyî bête diyarkirin. Em niha vê dikarin bêjin ku hê ev peyvên naverok ne diyar in. Jiyana siyasî ya Tirkan ji aliyê Sazûmana Ewlekariya Neteweyî, artêşê û dezgahê şerê taybetî tete birêvebirin. Ev dezgah xwedî giranî ne. Heta ev wa be û dezgahên mîna meclîsê û avahiyên ji aliyê xelkê tene hilibjartin nebin xwedî gotin, dê demokrasiyê li Tirkiyê qet rûnene û xwe negre.

### SİNORAN RAKÎN

- Hun rewşa tevgera rizgarîxwazî ya gelê Kurd (KUKM) çawa dinirxînin, hun dikarin bêjin?

Tevgera rizgarîxwazî ya neteweyê Kurd (KUKM), bi serfirazî ketiye rê. Edî Kurd şiyar û serwest in, dizanin xwe rêxistin û xweorganîzekirin çendî girîng e. Kurd di her alî de xwe bi rêxistin dikin... Giş ref û baskên civata Kurdî xwe didin hev û xwe ava dikin.. Bi şerê gerîla rê xebata diplomatîkî jî xwe derdixe pêş. Jiyana kulturî geş û zindî dibe. Çalakiyên girêda yê wêşan û çapemeniyê ne, wêje, folklor, dirûk û erdnîgariyê ne gav bi gav dipişkivin û gul vedidin... Ji nav Kurdan mirov û şexsiyetên nuh derdikevin... Mîna nivîskarê Kurd, roman nivîsê Kurd, rojnamenî-

vîsarê Kurd... Ev giş dilê mirov hênik dikin û li ser wêbêyê jî me re hin tiştan dibêjin...

- Tevgera rizgarîxwazî ya neteweyî xwedî derbasbûneke dirêj e, belê heta niha organeke neteweyî ya welatgir nehatiye pê, ev dê çawa bête çareserkirin?

Perçebûyîn, serxet û binxetbûyîn, berî her tiştî pêwîste di serî û mêjiyên mirovan de bête mehkûmkirin. Sînor gerek ewil di raman û fikirên xelkê de bihilin. Ji bo vê jî li ser zîmanê Kurdî, dirûka Kurdan, kultura Kurdan û erdnîgariya welêt lêkolîn û lêgerîn bête kirin. Di nav giş Kurdan de belavkirin û firehkirina alfabeya Latîni divê. Her wiha perçebûyîn, sedemên perçebûyînê, rewşa perçebûyî û bandêra vê rewşê li ser gelê Kurd gerek bête nixandin.

Me bi çavên xwe dît bête di meclîsa Tirk de êrişên çawa çûne parlamenterên Kurd û çendî heqaret û çortî hatin kirin di derbara wan de, Ji vê wêdetir darvekirin û şeniqandina wan hate xwestin. Belê li aliyên din "ferqa me nîne, em di xweşiyê de û nexweşiyê di bi hev re ne" dibêjin. Ev dirûtiyê û fenbazî ye. Kes baweriyê bi van peyvên nayîne. Dema gerîlayekî Kurd dikeve, şehîd dibe,

kezabên Kurdan dişewitîn û nema dilê wan dire xwarinê. Belê partiyên siyasî yê Tirk, çapemeniya Tirk jî kêfan re nizanin çî bikin. Di nav bervajî û bermeqlûbiyeke bi vî tewrî de sloganê jorîn "ferqa me nîne" tete ducarkirin. Kurd gerek vê dirûtiyê heşkere û şermûzar bikin. Ji ber van tiştan gişan gerek Kurd amadeyiya avakirina meclîseke Kurdî bikin. Gerek meclîsa xwe damezrînin. Fikara civandin û li darxistina meclîsa Kurdistanê dinasîne bête ku xebat û berxwedana Kurdan xwe gihandiyê koçbereke çawa.

### ALİKARIYA TEVGEREN KURD

- Îro li dinyayê gelek biwêj (term) tene guhertin. Lê biwêjenasiya (terminolojiya) tevgerên Kurd li ciyê xwe sekiniye. Hêji serxwebûn û otonomî du biwêj, ên liber yekitiya neteweyê ye. Hun çawa dibînin van her du biwêja?

Tevgerên Kurdan, di riya welatekî serbixwe, demokratîk û yekbûyî de bi peşve diçin. Raman û livbaziya PKK di riya welatekî serbixwe, demokratîk û yekbûyî alternatîfêke girîng xwuya dike. Lê ji bo ku welatê Kurdan perçe buye û hatiye belavkirin gihandina vê armancê jî îro heya bi sibe ne hesaniye.

Di neqebînê de hinek pevajojê di jî çêdibe. Dê tevgerên Başurê Welêt Rojhilatê Welêt bi partiyê re alîkarî bikin, ev alîkarî mecbur xwuya dike.

- Ji we "Welat" bête pirsîn, bi kurtî hun ê çî bêjin?

- Welatekî belavbûyî, perçebûyî, parbûyî.

Mêtingeha nav dewletan.

Welatekî ku namusa wî di ber destan de xespbûye.

Kurd?

- Neteweyekî (miletêkî) ku namusa wî xespbûye.

Civakeke xerabûyî.

Civakeke kefî.

Hun di pirtukên xwe de dibêjin, "Kurdistan ne Kurdistan'a keyn e." Çi ne ew faqtorê ku rêya welatekî nuh vekirin?

- Di sala 1984'an de têkoşîna gerîla ku li Bakurê Welat dest pêkir civaka Kurdan guhartiye. Îro civaka Kurdan li xwe dipirse. Li pirsên xwe dibe xwedî. Dizane ku statu û cihê wê di nava civakên Tirk, Erab û Farisan de çiqas kêr mayiye. Têkoşîn, li nava gel tev belabûye: Gundi, karker, esnaf, xwendevan, jin... herkes dinava têkoşîna rizgariya neteweyî û civakî de ne.

### MEBÛSÊ HEP'Ê Û SHP

- Hun siyaseta partiya HEP'ê çawa dibînin?

HEP gerek bête xwirt kirin. Di nav xelkê de piştgiyariya HEP ê mezin e. Ji vê awirê em dikarin bêjin ev partî li Tirkiyê jî partiyê din dinamiktire. Belê ji bo ku HEP bi hêz bibe û erkên xwe bîne cîh, parlamenterên HEP ê divê xwe jî SHP ê vedin. Piştgiyariya koalîsyona partiyên DYP-SHP li derveyî SHP jî dikare bête kirin...

- Enstîtuya Kurdî dê bête damezrandin, di nav damezrênerên vê enstîtuyê de hun jî hene. Gelo xebata we di çî warî de ye. Hun dikarin ji kerema xwe re jî me re bêjin?

Damezrênerê Enstîtûya Kurdî, Navenda Çanda Mezopotamya jorîn e. Enstîtû bête tirs dikare bête damezrandin.. Tiştê kêr avahiyeke, avahî ku peyde bû lewha "Enstîtûya Kurd" dê bête hilavistin... Hewl û xebatên girêdayên naveroka enstîtûyê ne û enstîtû dê çî çawa bike bi xwirtî berdewam in...

- Piştî 70 salên qedexeyî û bendkirina zîmanê Kurdî, rojnama ku dê bête weşandin bi baweriya we divê çawa be?

Rojnameya Kurdî berê berxwedan û xebata Kurdan e: Rojname pêwîste xwerû Kurdî be. Divê xwedî siyaseteke zelal û heşkere be. Û her wiha nabe çewtê vê siyasetê bikeve... Wekî din pêwîste rênivîs û rêzimana rojnâmê tekûz be, di dem û roja diyarkirî de derkeve. Wek mînimê heger hefteyî be gerek her hefte di roja xwe de amada bibe. Divê cih bide wêne (resim) û nûçeyan û gotarên aktûel jî nabe ji bîra bibin.

Hevpeyvîn: A. Keskin

welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar  
• Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat  
• Navnişan (Adres): Başmushahip Sok. Talas Han 16 Kat: 3 No: 301 • Tel-Fax: 512 12 87 • Cağaloğlu / İstanbul  
• Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ